

OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



43
—
1995

NAVEROK

Konferansa Navneteweyi ya Mem û Ehmedê Xani	3
Çend Qesideyên E. Xani -Vazgal Bazidi	
û M.Emin Bozarslan.....	4
Çar şîr ji: Kemal Burkay	12
Du destanê neteweyi:	
Mem û Zin û Kalevala- Haluk Öztürk	14
Tehsin TAHA wê dî muzika me da biji	18
Çend gotinêñ bijarte	22
Pexşana kurdi ya huneri (2)- Ferhad Shakely.....	23
Peyvên dûhev (1) - V. Bazidi	31

Wêneyê bergê pêşin: Antonê Mirzo. Bergê piştê: Seraya Ishaq Paşa li Beyazidê

Sal: 17

Hejmar: 86, Tebax 1995

ISSN 0283-5355

XWEDI: KOMKAR-Swêd
BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN
NAVNIŞAN: Gustavslundsv. 168, 1 tr
161 36 STOCKHOLM
TELEFON : 08/ 26 23 75
HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska
Arbetarföreningen
ANSVARIG UTGIVARE: Ş.BOTAN
ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM
FAX: 08/ 25 38 57
PG: 458980 - 0

KONFERANSEK

Cihê Konferansê:

DRK - Bundesschule
Auf dem Steinbüchel 22
53840 Meckenheim
Deutschland



Amadekar:
KOMKAR - Yekitiya Komelên Kurdistan
Hansaring 28-30, D-50670 Köln
Tel: 0049.221.123376 Fax: 0049.221.123485

Bî alikariya Xaç a Sor a Elman-DRK û
Veqfa Heinrich-Böll (Heinrich-Böll-Stiftung)

20-22.10.1995
Meckenheim

Konferansa Navnetewi ya
Mem û Zin û Ehmedê Xani



Amadekar:
KOMKAR - Yekitiya Komelên Kurdistan

Bî alikariya Xaç a Sor a Elman-DRK û
Veqfa Heinrich-Böll (Heinrich-Böll-Stiftung)



Çend qesideyên Ehmedê Xani -2

di destnîvisaren Mele İbrahimê Zîvîncî da

Amadekirin: Vazgal Bazidi
Noten lî bin qesideyan: M. Emin Bozarslan

Ez çûme baxê sorgulan
weqtê sehergahê, bî xef
Min di sedaya bilbilan(1)
dagirti bû her çar teref

Sewta hezar û qumriyan(2)
dengê rebab û mexniyan(3)
teşbihê bezma bengiyan(4)
hevdeng-i bûne ceng û def(5)

Manendê mest û serxweşan(6)
ez çûme bezma mehweşan(7)
Ebrûkevan ûçavreşan
cerg û dilê min kîr hedef

Peykan û cerg û dîl peri(8)
Ten bûye sindoqa beri(9)
Sindoq jî husnê ey peri
hêja li min bû kerb û gef(10)

Hêja li min bû kerb û kin
Zahir xezeb, batîn kenin(11)
Lê xemzeyek da min nehin(12)
aqlê me disa kîr telef

Disa hebiba çavbelek
Ihsan digel min bû gelek(13)

Lewra digel zulfên helek(14)
alûz me tinin qışt û lef(15)
Şetri û qışt û zulf û xal(16)
hem'yan lî ser ruxsarê al(17)
vîkra hebûn ceng û cidal(18)
lêk aliyan bûn sef bî sef(19)

Sef sef me di vîkra bî ceng
hindek Hebeş, hindek Fîreng(20)
Têkra birandin wek xedeng(21)
vîkra hebûn wan laf û lef(22)

Têkra hebûn dawa û şer
Der bûn lî min tipa Teter(23)
vîkra kîrin qelb û ceger
rêhtin jî dîl xwina bîkef

Rêhtin gelek xwina dilan
şehmarê zulfa ser milan(25)
bêrehm û mestê qatilan(26)
meyxwarê fincana sedef(27)

Wan meyxuran ebter kîrim(28)
Bêqût û bêenter kîrim(29)
wellah jî dîl ker ker kîrim (30)
Xani, bes e ah û esef

1- Seda: Dengan, dengê ku li tiştên wek zinaran û diwaran dikeve û li dora xwe belav dibe.

2- Sewt: Deng.

Qumri: Teyrek e, wek bilbil dixwine. Tê zanin ku di vê malikê da şâsiyeka nivisinê heye û awayê rast "sewta hezaran qumriyan" e; yani "dengê bi hezaran qumriyan".

3- Rebab: Sazek e; bi awayê "rubab" ji tê gotin.

Mexni: Stranên ku têngotin.

4- Teşbih: Wek.

Bezm: Meclisa kêt ahengê, civata kêfx-weiseyiû şayiyê.

Bengi: Evindarê sewdayi yê ku ji derdê evinê gêj bûye.

5- Çeng: Navê sazek e.

6- Manend: Wek.

7- Mehweş: Keç yan jina ku dişibe hivê, wek hivê rînd e.

8- Peykan: Sertir, serê tirê.

Peri: Firiya, bi hewa ket. Yani "sertira ku li cerg û dilê min ket, ew û cerg û dilê min bi hev ra firiyan û bi hewa ketin". "sertirê, cerg û dilê min firandin, bi hewa xistin".

9- Ten: Laş.

10- Hêja: Hêj.

11- Zahir: Di rû da, bi çavditin, eşkere. Batm: Nepeni, bi dizi, di bini da.

Ev malik di her du desnivisaran da ji weha derketiye. Lê belê dibe ku ev awa şas be û awayê rast "batin xezeb, zahir kenin" be. Lewra hozanên berê, bi pirani rexnê li yarêne xwe xistine ku bi çavditin bi wan ra dikenin. Le bi dizi li wan têngi xismê.

12- Xemze: Awir.

Nehin: Nepeni, bi dizi.

13- İhsan: Qenci. Yani "qenciya wê digel min gelek bû, gelek qenci li min kiribû". Dibe ku awayê rast, "İhsan digel min kir gelek" be.

14- Peyvika "helek" tê zanin ku bi şasi weha hatiye nivisin û awayê rast "xelek" e.

15- Alûz me tinin: Me alûz dikin, me hal xirab dikin.

Qişt: Tewirek xişir bûne, keç û jinan ew dane serên xwe.

Lef: Tewirek pêçek bûye, pir reng bûye, keç û jinan ew li serên xwe

pêçane.

16- Şetri: Tewirek xişir bûye.

17- Ruxsarê al: Rûyê sor.

18- Vekra: Bi hev ra.

Cidal: Têkoşin, mucadele.

19- Lék aliyan: Wisa tê zanin ku mexsed, "her birek li aliyek" e.

20- Hebeş: Reşik, zenci.

Fireng: Ev nav di dewrên berê da ji bo Ewru-piyan dihat gotin.

21- Têkra: Hemi pêkve, hemi bi carek, hemi gişt.

Xedeng: Tewirek tir bûye.

22- Laf û lef: Wisa tê zanin ku mexsed "gotin" e; yani "pevy û gotinên wan bi hev ra hebûn, pevyen xwe kiribûn yek".

23- Tipa Teter: Tipa Teteran. Ji Tataran ra "Teter" ji hatiye gotin.

24- Wisa tê zanin ku peyvika "vêkra" di her du desnivisaran da ji bi şasi weha hatiye nivisin û awayê rast "jêkve" ye. Yani "ji hev kirin û parce parce kirin dil û cegera mm". Lewra peyvika "vêkra" li vir, li vê malikê nayê.

25- Peyvika "zulf" di her du desnivisaran da ji weha yekani hatiye nivisin. Lê belê, bi ditina me, diwê bi awayê pirani "zulfén" be. Lewra zulfek tenê nayê ser milan; gelek zulf pêkve têngi ser milan.

26- Bi ditina me, diwê ku "bêrehm û mestên qatilan" be. Lewra qatil ne yek e; gelek in. "Yani" qatilên mest û bêrehm".

27- Yani "ew meyxurên ku ji fincana sedef mey vedixun".

28- Ebter: Bexêr û bêkêr, bêfêde.

29- Peyvika "enter" di desnivisarek da weha hatiye nivisin; di desnivisara din da ev malik qet tune. Bi ditina me, peyvika enter bi şasi weha hatiye nivisin; diwê ku tiştiki di be. Lewra maneyek jê ra tune.

30- Ker ker: Parce parce.

Ey dirixa mame tenha ez ji şemsa xawerê(1)
Xan û man têk bûne zulmet paşê wê
dêm'enwerê (2)

Pıştê lêvê wê venaxum nuqte ava Kewserê(3)

Min nevêt dinya bi carek paşê wê siminberê(4)

Ger bizanım ez di heşrê da nebinim dilberê(5)

Cennetê jê ci bikim? Pê wer bikim xakisterê(6)

Sed mixabin çû ji bal min ew hebiba çavbelek

Ah üefxanê'm şev ûrojan diçin hetta felek
(7)
Wê ji feryadêd-i mîn acız bûyin ins û me-
lek(8)
Mam di qeyda dax û derdan, paşê wan zul-
fîn xelek
 Ger bîzanîm ez di heşrê da
 nebinim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

Hicreta yarê bêhêtîm, şubhê finda şu'ledar
(9)
Ket'me halê iftiraqê j'ixtiraqê bûme nar
(10)
Ev vucûdek bêvucûdê'm soht û têkda bûm
xubar(11)
Mîn nevê dînya bî carek, paşê wan çavêt
xumar
 Ger bîzanîm di heşrê da ne-
 binim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

Ger di hina ez wefat bîm, bêtê ser mîn Ez-
reil(12)
Mujdeya Xuldê di wê gavê bidit mîn Ce-
breil(13)
Xîdir ûllyas hem ji bo mîn rabîbin disa de-
lîl(14)
Dê bibêjîm "mîn navêtîn Xuld û Kewser,
Selsebil(15)
 Ger bîzanîm di heşrê da ne-
 binim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

Çerxê kecreftar-i, waweyla ku ez heyran
kîrim(16)
Serbigerdan bûm, welêkin zêde sergerdan
kîrim(17)
Sergirani hate cengê, lew ku ez ferman
kîrim(18)
Paşê vê bêmirwetê serbirr kîrim, talan
kîrim (19)
 Ger bîzanîm di heşrê da ne-
 binim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

Zinhar, ey dositan, weqtê bîkîm ez hicretê
(20)
Van du misraan kitabet kîn li belgê kaxe-
tê(21)
Da di dest mîn da sened bin weqtê çûna
hezretê(22)
Erzîhalê mîn bîbîn mezmûn, di hina
ru'yetê(23)
 Ger bîzanîm ez di heşrê da ne-
 binim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

Xaniya, ev herzegoyi û xeta û nasewab(24)
Çend ji te sadîr dibin, ey bêedeb, ey bêhi-
cab!(25)
Ev qezaya Bari ye, pê razi be, ey
malxîrab!(26)
Belki bite mücîbê nari ji bo te ev cewab
(27)
 Ger bîzanîm di heşrê da ne-
 binim dilberê
 Cennetê jê çi bîkîm? Pê wer
 bîkîm xakisterê

1- *Ey: Ev ji bo gazi û hewarê ye; wek ku bêje "guh bide min".*

Dirixa: Xebinet, heyf, mixabin.

Şemsa xawerê: Roja ku ji aliyê rojhîlat hiltê.

2- Zulmet: Tari.

Dêm'enwer: Dêmroni, yara ku dêmên wê roni ne, roniya didin.

3- Di du desnîsaran da, di şûna "nuqtê" da "mutleq" derketiye. Yani "qet û qet", ji bin".

4- Siminber: Ewa ku sing û berê wê zivin e.

Di desnîsarek da ev malik wek malika 3'yan derketiye û weha hatiye nîvisin: "Bêgerar im şubhê zibaq, bê ewê siminberê".

Peyvika "Zibeq" bi mana "ciwa" ye.

5- Heşr: Qiyamet.

6- Xakister: Xweliya agir.

Di desnîsarek da "xaka kesterê" hatiye nîvisin. Ew şas e.

7- Efxanê'm: Efxanê'n min, hewarê'n min. Ji bo ku piveka malikê neşikê, her du peyvik hatine kurtkirin û weha pêkve hatine nîvisin.



Tırba Ehmedê Xani

Foto: ARŞİVA ROJA NÜ

Di du desnivisaran da, ev malik weha hatiye nivisin:

"Ah û efxanêd-i min daim dicûn hetta felek".

8- Wê: Wa ne, aha.

Di du desnivisaran da ev malik wuha hatiye nivisin:

"Hem ji feryadêd-i min aciz dibûn ins û melek".

9- Hicret: Dûri, dûrketin, cudadayi.

Behêtim: Ez helandim.

Şubhê finda şu'ledar: Wek finda ku ditewişte û ronayı dide.

10- Halê iftiraqê: Reuşa dûriyê, halê dûrketinê û cudadiyê.

Ji ixtiraqê bûme nar: Ji ber şewatê ez bûme agir.

11- Wucûdê bêwucûd'm: Hebûna min abêhebûn, hebûna min a ku di hukmê tunebûnê da ye, hebûna min a pûç.

Di du destnivisaran da ev malik weha hatiye nivisin:

"Ez wucûdek bê wucûd im, sohtim têk da bûm xubar". Lê belê di wi awayi da piveka malikê dişikê; ew awa ne rast e.

12- Hin: Dem, wext.

Ezreil: Firişteyê giyanstin, melekê ku

giyanê mirovan distine. Navê wi "Ezrail" e; ji bo ku piveka malikê neşikê bi awayê "Ezreil" hatiye nivisin.

13- Mujde: Mizgin. Peyvik Farisi ye.

Xuld : Navê qatek ji heşt qatên bîhiştê ye. Bi giştî ji bo bîhiştê ji tê karaninê.

Navê "Cebraîl" ji, ji bo ku piveka malikê neşikê, bi awayê "Cebreil" hatiye nivisin.

14- Xîdr û Ilyas: Du Pêxember m. Li gor baweriyê, heta roja qiyametê sax m û ji kesen muhtac ra dibin alikar.

15- Selsebil: Navê kaniyeka bîhiştê ye.

16- Çerxê kecreftar: Çerxa meşxwar, çerxa ku meş û gera wê xwar e, çerxa ku xwar digere. Mexsed, felek e.

Waweyla: Ev peyvika xemxwarinê ye, wek "ax û wax".

Heyran kirim: Şaş kirim, gêj kirim, di heyretê da histim, heyirandim.

17- Sergerdan: Sergêj, serlêgeriyayı. Yani "Ez ji xwe sergêj bûm, lê belê wê pirtir û zêdetir ez sergêj kirim".

18- Ez ferman kirim: Fermana min derxist.

Di desnivisarek da ev malik weha hatiye nivisin: "Bê delil û a'ql û hoş, carek ez bêiz'an kirim".

19- Bêmirwet: Bêmirovi, nemirov, kesê ji exlaq û tevgerên miroviyê dûr; peyvik li mana "bêinsani" ji tê karanin.

Dî desnivisarek da ev malik weha hatiye nivisin:

"Zêde vê bêmirwetê ev reng-i ez talan kirim".

20- Ji bo ku piveka malikê neşikê, tipa "i" li peyvikên "zînhar" û "dostan" hatiye zêdekim û ew peyvik bi awayê "zînhar" û "dositan" hatiye nivisin.

Weqtê bikim, dema ez hicretê: Dema ez cibil bibim, dema ez mala xwe bar bikim, dema ez ji vê dinê biçim, dema ez bimurum.

Dî du desnivisaran da di şûna "bikim" da "dikim" derketiye.

21- Misra: Malik, rîzeka helbestek.

Kitabet kim: Binivisin.

Ji bo ku qafîye rast bê, peyvika "kaxid" bi awayê "kaxet" hatiye nivisin.

22- Weqtê çûna hezretê: Dema çûyina huzûrê, dema ku ez dicim huzûrê. Belki mexsed ji "huzûr" ê, huzûra Xwedê ye.

Dî destnivisarek da ev malik weha hatiye nivisin: "Da di destê min bibitîn ew di hîna hezretê". Yani "dema huzûrê".

23- Erzial: Daxwazname.

Mezmûn : Naverok. Yani "bila naveroka wan ji min ra bibe daxwazname".

Hîna ru'yetê: Dema ditmê. Belki disa mexsed, dema ditma Xwedê ye.

Dî du desnivisaran da ev malik weha ye: "Wesfê halê min bibêjm bun di hîna firqetê". Yani "di dema cudayı û dûriyê da, bun salixê rewşa min bidim, qala rewşa min bikin".

24- Xaniya: Ey Xani.

Herzegoyi: Gotma tiştên tewş û vala û bêmane.

Nasewab: Ne rast, şas.

Dî desnivisarek da ev malik weha hatiye nivisin:

"Xaniya pir goti bê hed û qiyas û bê hisab".

25- Bêhicâb: Bêfedi, ji ber ku berê di nava bozan û niviskaran da tore bûye ku di heqê xwe da peyvîn weha binivism. Xani ji di heqê xwe da weha gotiye.

26- Bari : Navek ji navêñ Xwedê ye.

27- Mûcîbê nar: Semedê agir, semedê ketina agirê canemê.

Neqqaşê ezel rojê serlewheê rengin da(1) Pergar'i ji destan bû, sersefheê tezyin da(2)

Tezhîb üzerefşan da serlewhê kitêba işq(3) Resma ezeli kêşa, neqşê xwe nû ayin da(4)

Dibace ku inşa kîr, fîhrîste ku imla kîr(5) Cildek ji enasîr bit, nefxek bi sifalin da(6)

Etfal û melek hatîn, westane dî bustani(7) "La ilme lena" gotin, ebced bi xwe telqin da (8)

Wan saderuxan, meşqê işqê ku temenna kîr(9) Xettati, ji husnilxett sermeşqeki zêrin da(10)

Wan cumle "en'el-Heq" got, mîn "Wahidê Mutleq" got(11)

Saqi bi xwe ez girtim, camek meyê noşin da (12)

Mîn noşî û serxweş bûm, filhal-ı muşewweş bûm(13)

Ez çar û neh û şeş bûm, mîn tekye bi balin da (14)

Şahid bîbi, ey Xani, mehbûbe perestar im(15) "Ha" nuqte li bin dani, lew mame di nefrin da(16)

Ma secde tenê mîn bir ber sûrêtê mehbûban? (17)

Iblisi nebîr secde, lew maye di nefrin da(18)

Ez çûme derê dêrê, mîn di ku ruhek wellah(19) Tekrar-ı musewwîr bû, hetta di nihalin da (20)

Herçi ku me pîr vêkir, hîndi te nezer lê kîr(21) Mîn seyr-ı li yekê kîr, lewra me dil û din da

Ê bû di Zulieyxayê, ê di ku di Yûsuf da(22) Mecnûn-ı di Leylayê, Ferhad-ı di Şîrin da

Mazûr e, eger sofi bû munkirê mehbûba Ker dê ku tesewur ke sîrra ku di dûrbîn da(23)

Şahid bi tu ey zahîd, mehbûbeperest im ez(24) Bê şahid û mey nabi, şêxê me ev ayin da(25)

Cani ji te ey Xani, canan ku bîxwazi, tu(26) ta nuqte li ser dani, filhal-ı de mîzgin da(27)

1- Neqqaşê ezel: Nexşkarê berêya berê, nexşkarê ezeli.

Serlewhe: 1. Sernivisar. 2. Ayina (resim) ku mamosta wek nimûne ji şagirdên xwe ra çêdike, da ku ewana ji wek wê çêkin.

Lî vir mexsed mana 2.'an e.

Di desnivisarek da "serlewhekê" hatiye nivisin.

2- Pergar: Pergel. Peyvik Farisi ye.

Pergar'i ji destan bû: Pergela wi ji destên wi bû, destên wi karê pergelê didit û wisa hunermend bû.

Sersefhe: Ayina ku li serê rûpelê ji aliyê mamosta va tê çêkirin, da ku şagird lê binêrin û wek wê çêkin.

Tezyin da: Xemiland, bi awayeki xemilandi da û çêkir.

Di desnivisarek da "sersefhekê" hatiye nivisin.

3- Tezhib û zerefşan: Nivisina tiştek yan ji xêzkirma ayinek bi rengê zérin, bi avzêrê; avzêrkirma nivisinek yan ji ayinek.

Di desnivisarek da "tezhib û zerefşan kir" derketiye.

4- Ayin da: Resim kir, bi awayê resmê da, wek ayinek da.

5- Dibace: Pêşepeyv, pêşgotin, pêşkêsi.

Fibrîst: Têdayiya pirtûkek û wd., lista ku beşen sereke yên pirtûkek û wd. nişan dide.

İmla kir: Nwisi.

6- Enasir: Piraniya "unsur" e.

Peyvika "bit" di her du nivisaran da ji weha derketiye; lê belê bi ditina me ev awa şas e û awayê rast "best" e, ku bi mana "girêda" ye; yani "cildek ji unsur an girêda".

Nefxek : Pifek.

Sifalin: Tiştê ji axê, tiştê ku têkiliya wi bi axê heye; her weha, tiştê ku ji axê tê çêkirin.

7- Etfal: Piraniya "tifl" e, ew ji bi mana "zarûk" e.

Westane di bustani: Sekimine li bostan, sekimine li baxçê.

8- La ilme lena: Zanina me tune, em tiştek nizanın.

Ebced: Beşek e ji alfaba Erebi; tipênu ku di alfaba Erebi da tênen karanin, tê da ci digrin û tênen nişandan.

9- Saderuxan: Saderûyan, ewen ku rûyên wan sade û paqij bûn.

Meşq: Fêrbûna nivisinê li gora numûneya

ku mamosta dinivise.

Di wi awayê nivisinê da mamosta rêzek wek numûne li jorê rûpelê dinivise, ku ji wê rêzê ra tê gotin "sermeşq"; şagird ji li gora wê numûneyê dinivise û bi wi awayi fêrê nivisinê dibe. Peyvika "meşq" bi mana mecazi ji bo fêrbûn û hinbûna hin tiştên din ji tê karanin. Lî vir ji ji bo evinê hatiye nivisin.

Temenna kir: Daxwaz kir, xwest.

10- Xettat: Hostayê nivisinê, kesê ku dinivise, katib, kesê ku pişeyê nivisinê xweş dizane (ev peyvik bi mana "niviskar" nayê karanin; dwê mirov her du yan têkili hev neke).

Husnulkett: Xweşikiya nivisinê, nivisina xweşik û spehi.

11- Cumle: Pêkve, bi giştî, hemi.

Ene'l-Heqq: Ez Heqq im, ez Xwedê me.

Wahidê Mutleq: Ewê ku tenê ye û hêza wi bêsinor e. Mexsed Xwedê ye. Di vê malikê da işaret bi aliyê mertebeyeka tesewwufê ve hatiye kırın, ku jê ra tê gotin "wahdetuluucûd"; yani "yekitiye hebûnê". Lî gora ditina tesewwufkaran, kesê ku bigije wê mertebeyê, di her tiştî da hebûna Xwedê dibine û bi wi awayi li bal wi hebûna Xwedê û hebûna afrandiyân dibe yek.

Hozan xwestiye bêje ku dengê wan hemiyan wek dengê Xwedê hat min û hebûna Xwedê ani bira min; hingê min got ev Xwedê ye ku di hebûna wan da û bi dengê wan xwe dide zanin.

12- Saqi: Meygêr.

Camek meyê noşin da: Qedehek mey da vexwârm; yani da min.

13- Filhal: Tavil, hema di wê gavê da.

Muşewweş bûm: Têkil hev bûm, li hev ketim.

14- Nayê zanin ku mexseda wi ji "çar û neh û şeş" çi bûye; dibe ku xwestibe bide zanin ku hingê 19 sali bûye. Lê belê ev ji ne zelal e, tenê iktimalek e.

Min tekye bi balin da: Min pala xwe da balgiyê; min pala xwe da balifê. "Balin" Farisiya balgiyê, balifê ye.

15- Mehbûbe: Yar, keç yan jina evandi.

Perestar: Ibadetkar.

16- Ha: Tipeka Erebi ye; "h" ya peyvika "mehbûbe" ji ew tip e.

Dema nuqte li binê vê tipê bê danin, ew dibe "c". Eger mexsed peyvika

"mehbûbe" be, dema nuqte li binê "h" ya wê bê danin ew dibe "mecbûbe"; ew ji bi mana "parçebûyi" ye. Lê belê nayê zanin ku mexseda wi ci bûye.

Nefrin: Nifir.

17- Sûretê muhbûban: Şekl û ditin û awayê yaran; her weha rûyê yaran.

18- Nefrin: Lanet, anina lanetê. Li vir mana peyvikê ev e.

19- Di desnivisarek da ji "min diye ku rûhullah" derketiye.

"Rûhullah" bi mana "giyana Xwedê" ye.

20- Musewwer bû: Ket şekl û sûretek, şekl û sûretek girt.

Di nihalin da: Di şaxên teze yêñ zirav da.

21- Peyvika "vêkir" di her du desnivisaran da ji weha derketiye. Lê belê wisa tê zanin ku ev tişteki di ye û bi şassi weha hatiye nivisin. Di Kurdi da "vêk-ketin" û "vêkxistin" hene; lê "vêkirin" ne-hatiyebihistin.

Te nezer lê kir: Te lê nihêrt, te lê mëze kir.

22- Yani giyanê ku di Zuleyxayê da bû û giyanê di yê ku di Yûsuf Pêxember da bû.

23- Dê ku tesewwur ke: Dê çawa bifikire, dê çawa aql bigihin'ê, dê çawa fam bike û di hisê xwe da bici bike.

Ev malik Xaniyê nemir, bûye peyveka pêşîyan a Kurdi. Di kovara "Jin" da ji di nava peyvîn pêşîyan ên Kurdi da ci girtiye û hatiye weşandin. "Jin", cild I, rûpel 272.

24- Zahid: Ibadetkar, kesê ku destê xwe ji dinê kişandiye û xwe daye ibadetê.

Mehbûbepерest: Yarperest, yarevin.

25- Şahid: Li vir bi mana "rind, xweşik, bedew" e.

Ev ayin da: Ev resim da, ev şekil da, ev awa wek ayinek û resmek nişanê me da.

26- Cani: Giyan, can, tipa "i" ji bo kifşkirimê hatiye dûwayiya peyvikê. Li heremên Hekariyê û Badinan, ji bo kifşkirimê û nasandinê tipa "i" tê dûwayiya navên nêrin; tipa "ê" ji tê dûwayiya navên mîyin. Lê li piraniya Kurdistanê, ji bo kifşkirim û nasandinê, tipa "a" yan ji "e" ya pêşin a navên nêrin dibe "ê"; wek "welat" dibe "welêt", ziman dibe "zimên" "pez" dibe "pêz", "çem" dibe "çêm" û wd. Lê herçi navên mîyin, li her derê Kurdistanê ji bo kifşkirimê tipa "ê" tê dûwayiya wan; wek "xanim" dibe "xanimê", "xuşk" dibe "xuşkê" "xalti"

dibe "xalтиyê", "qelem" dibe "qelemê", "pirtük" dibe "pirtükê" û wd. Di hm rewşan da ji qet tiştek nayê dûwayiya na-vîn mîyin û ew xweser têñ nivisin.

Canan: Yar, yara evandi.

27- Peyvika "ta" di her du desnivisaran da ji weha derketiye. Lê belê bi ditina me, ew bi şassi weha hatiye nivisin; awayê rast "da" ye, ku bi mana "daxwaz, tenbi" ji tê karanin.

Hozên bi vi awayi daxwaz ji xwe kiriye û tenbi li xwe kiriye ku daxwaza yarê bine ci; ji xwe ra gotiye "da nuqte li ser dayni, da ku nuqte li ser dayni". Tê zanin ku mexsed ji danina nuqteyê ji ev e ku nuq-teya tipa "c" ya serê peyvika "cani" bide ser wê tipê; hingê peyvika "cani" dibe "Xani", ew ji navê Hozên e.

De mizgin da: Bide di mizginê da, di mizgina wê daxwaza yarê da bide.

Mana malikê bi tevayı weha dibe: "Da tu nuqte li ser peyvika "cani" dayni û wê biki "Xani" û hema wê gavê di mizgina wê daxwazê da bidi". Yani "ne ku tenê giyanê xwe bide, lê belê hebûna xwe bi carek di mizgina wê daxwazê da bide yarê".

Bê guman ev iştimalék e; dibe ku hm iştimalen di ji bén aqilé mirov.

.....
(1)

Min di şeva cum'eê esmerek, ez bûm xu-lam

Çûm tewafa rê û laman, dilbera şirinhudam(2)

Şewq û nûra xet û xalan, dîl muferreh bû temam(3)

Esmerê min, dilberê min li te bin yüz bin selam(4)

Sed selam û selawatê Padişahê qûdretê(5)
Ew bibarin her mudamet bejin û bala qametê(6)

Bê hebiba xwe me navê qet duxûla cenne-tê(7)

Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam

Ez feqirek bênesib im, nûrê Zatê Zulcelal(8)

Her du ebrûyê hilal in li cebinê bûne xal(9)

Ez merizek bêdewa me, hatime nik erzê hal(10)
Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam

Leb eqiq û durr û mercan, ew ji eslê madenê
(11)

Qemer û Şemsê di bircan, rohniya wan da tenê
(12)

Sen'et û karê Xwedê ne, xal û nişan ketin'ê
Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam

Ey dilo rabe xwe pêkbine, mecalâ bit buhar
Bax û bostanê me xweş bû nêrgiza mest xumar
Gul gul û çiçek û alal bi xwe bûne çar bi çar
Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam

Gul gul û çiçek û alal, ew ji rengê te ges in
Sîmbil û rehan û sorgul, ew ji bêhna te xweş in
Misk û enber û bixûr e, em ji bêhnan serxweş in
Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam

Sed selam û selewate Padişahê abidan(13)
Ew bibarin her mudamet li Medina Ehmedan
(14)

Rewzaya simamubarek, hem li ser wan merqe-
dan(15)

Esmerê min, dilberê min, li te bin yüz bin selam.

1- Gerçi li serê desnîvisarek hatiye nivisin ku
ev helbest ji ya Xani ye, lê belê uslûba vê helbes-
tê qet naşibe uslûba helbestên Xani; di
dûwayiya wê da ji navê Xani tune. Dibe ku ev
helbest, helbesta hozaneki di be; ditma me wisa
ye.

2- Rê û lam: Ev du tipêr Erebi ne; yani "r"
û "l" ne. Nayê zanin ku mexseda hozên ji wan
çı bûye.

Şirinhudam: Peyvika "hudam" di her du
desnîvisaran da ji weha derketiye; lê belê ma-
neyek jê ra tune; kifş e ku bi şazi weha hatiye
nivisin û awayê rast "kelam" e; ew ji bi mana
"pevy" e; bi wi awayi peyvika sazber dibe
"şirinkelam"; yani "peyşirin".

3- Xet: Xêzên rû.

Dil muferreh bû: "Dil kêfxweş bû, şâ bû; yani
ji ber şewq û nûra xet û xalan, dil şâ bû". Dibe
ku awayê rast di şûna peyvika "bû" da "kir"
be; yani "şewq û nûra xet û xalan dil şâ kir".

4- Di desnîvisarek da, "esmera min, dilbera
min" derketiye.

Yüz bin: Sed hezar. Peyvik Turki ye.

5- Padişahê qudretê: Padişahê hêzê û şiyânê.

Mexsed Xwedê ye.

6- Mudamet: Bi dewam, tim, bi awayeki
timi.

7- Hebib: Yar

Duxûl: Têketin, têketina ciyek,
daxîlbûna di ciyek da.

8- Zatê Zulcelal: Zatê xwediyê gewreti
û mezinatiyê. Mexsed Xwedê ye.

9- Cebin: Eni.

10- Meriz: Nexweş.

Bêdewia: Bêderman.

Hatime nik, erzêhal: Hatime nik te, ji bo
erzkırma halê xwe; hatime nik te, ji bo ku
rewşa xwe ji te ra erz bikim, pêşkêş
bikim.

11- Eqiq: Kevireki rûmetbilind û
giranbuha ye, rengê wi sor e.

Durr: Mirari.

Ji eslê madenê: Yani rastin, heqiqi, esli.

12- Qemer: Hiv.

Şems: Roj, yani "Hiv û rojên ku di
bircan da ne, tenê ronayiya wan lêvên
wek eqiq û mirari û mercanan dan, ro-
nayiya Hiv û Rojê ji wan lêvan bû".

13- Padişahê abidan: Padişahê ibadetka-
ran. Mexsed Xuedê ye.

14- Ehmed: Navek ji navê Pêxember e.

15- Rewze: Navê merqedâ Pêxember e;
mana peyvikê "baxçe" ye.

Simamubarek: Ewê ku rûyê wi mubarek
e, ewê ku sinçeyê wi piroz e. Mexsed Pê-
xember e.

Merqed: Mana peyvikê "ciyê xewê, ciyê
razanê, ciyê nivistinê" ye. Peyvik wek ter-
imek ji bo gorêñ kesêñ qedirbilind û
gewre tê karanin. Ji bo ku qedirbulindi û
gewretiya kesêñ weha bê diyarkîn,
dema qala yekê ji wan tê kîrin, nayê gotin
"gora filan kesi", lê tê gotin "merqedâ
filan kesi". Mesela dema qala Xani tê
kîrin, nayê gotin "gora Xani", lê tê gotin
"merqedâ Xani"; yani "ciyê razana Xani,
ciyê nivistina Xani, ciyê xewkirina Xani".



Çar şîr ji Kemal Burkay

EVİN

Evin çi ye, germiya dest û çavan e
Evin çi ye, jî dîl tê, kîlam e
Baran e lî ser axa havinê
Pel û ba ye
Evin azadi ye
Hîm dîlop e, hîm derya ye

Nisan 1990

HOZAN Û ROBOT

Dewra robotan hat, hevalo, em bîçin
Merîvên pola çêbûn
Ne hewcedari dîl in
Xeribê ken û giri ne
Lî vê dînê ci nema bo hozanan
Êdi em bîçin

Çileyê Paşin 1990

BAHOZ Ú BÊDENGÎ

Bahoz hêrsa ezman e
Û hêrs bahoza mirovan
Bêdengî teqi
Û darê nîşkava kulilk dan
Brûskê vejand, şev bû roj
Baran hat
Xwe berda ser axa ti
Roj dibe dilan e
Roj dibe tofan
Jiyana mirovan ji

Sıbat 1990

CIWANI

Baranê erd û ezman şûşt û çû
Royê dinya pêça
Weki havin bî şunda hat
Tu ji xwe bîşo, li xweke
Porê xwe şeke
Derkeve çolê
Weki cîwani bî şunda hat

Çiriya Paşin 1990



Mem û Zin û Kalevala

Haluk Öztürk

Dı çandên gelek miletan da destanen neteweyi hene ku wek kevirê koşeyê wan çandan têن qebûlkirin. Mesela "Mem û Zin" `a kurdan, "Kalevala" ya finlandiyan û "Poems of Ossian" ya ingilizan ji van destanan in.

Dı dirokê da destana heri kevin Destana Gilgamêş e, ku dı eyni wextê da wek destpêka edebiyata niviski ya heri kevin tê zanin, li dor 2600 sal BZ (beri zayinê, yani beri bûyina Isa) hatiye nivisandin. Li Ewrûpayê destanen heri naskiri, destanen yûnani, İlyada (ya dengbêj Homeros 700 sal BZ) û Odesa ne. Evana ji hemû destanen Ewrûpi ra bûne modelên bingehin.

Sala 1985`an, gel û dewleta Finlandiyayê 150 saliya destana xwe ya neteweyi piroz kîribûn. Isal kurd ji 300 sa-

liya Mem û Zin`e piroz dikin. Dı nav sala 1995`an da li ser "Mem û Zin" ê û hostayê mezin Ehmedê Xani gelek konferens, civin û seminar çêbûn û hina ji çedibin. Herwisa dı rojname û kovaran da li ser Ehmedê Xani û efrandinêni wi gelek nivisar û lêkolinêni cuda tên weşandin.

Dı vê nivisarê da em ê bî kurti behsa destanen neteweyi yên miletên din bîkin û xasma ji li ser destana "Kalevala" yê bisekinin. Em ê hewl bîdin ku "Mem û Zin" ê û "Kalevala" yê ji hînek aliyan va rûberi hevdu bîkin. Bî vê yekê mebesta me ew e ku em di perspektiveke diroki û gerdûni ra li destana "Mem û Zin" û niviskarê wê mîze bîkm; û wek çavkaniyeke çanda neteweyi rol û gîringiya Mem û Zin`e û Ehmedê Xani raçav bîkin.

ROMANTİK, FIKRA DEWLETA NETEWEYİ, BERHEVKIRIN Ú NIVİSANDINA BERHEMÊN FOLKLORİ

Caşa tê zanin di nivê duwemin yê sedsala 18-an da, li roavaya Ewrûpayê cereyanek kulturi ya nû dest pê kîr: Romantik. Dî bingehê derketina romantikê da guhartinên civaki yê mezin hebûn. Lî welatê romantikê yê pêşin ango li Ingilistanê wê çaxê bi şoreşa endustriyê ra gund vala dibûn, nufûsê bajaran zû zêde dibû; jimara sermayedar û fabrikatorên nû û herwisa jimara proleterên endustriyê di zemaneki kurt da zêde dibû. Dî wê demê da şaireki ingiliz bi navê Goldsmith helbesteke geleki xemgin li ser "Gundê terkkiri" nîvisi. Jiyana nû li Londonê jî hin niviskarêñ dîn ra ji zehf gîran dîhat. Gelek jî wana nerazibûna xwe nişan dîdan û li jiyana berê dîgeriyan. Lî ser diroka kevin, efsane, çirok, klam û stranêñ gelêri enteresa niviskarêñ romantikê her dîçû zêdetir dibû. Lî gor wan, her gelek xwediyê "ruheki gelêri" bû, ku mîrov dîkaribû di efsane, çirok û stranêñ wan da bibine. Her geleki ku xwediyê eyni dirok û eyni zîmani bû, gerek e wi dewleteke xwerû saz bikira. Aha dî wê serdemê da edebiyata heri bi rûmet destan bûn. Lewra destanekê şerefa mîleteki temsil dîkir, û wê dîkaribû nav û dengê geleki baş bide bîhistin.

Dî sala 1768 án da li Ingilistanê kese-ki bi navê James MACPHERSON çend şîer dan çapkîrin û belavkîrin. Jî van şîeran ra digotin "Stranêñ Ossian". Wi iddia dîkir ku ev şîer 200 sal piştî bûyina Isa, jî ali hozaneki kelti bi navê Ossian va hatine nîvisandîn û wi (Machperson) ew stran wergerandîne ser zîmanê ingilizi û dane çapkîrin. Piştî vê yekê li Ingilistanê şabûn û hey-

raniyeke geleki mezin peyda bû, jî ber ku pê hesiyan ku di diroka wan da ji wek HOMEROS'ê yûnaniyan hozane-ki kevnare hebûye. Lî dûra eşkere bû ku Machperson bî xwe ew nîvisandîne. Ne bî navê Ossian hozanek hebûye, ne ji stranêñ wi. Heta ku blofa Macpher-son eşkere bû, destana wi zûda nav û dengê xwe li çarali Ewrûpayê dabû bîhistin. Û bî van şîerêñ xwe, wi dewra romantikê daye destpêkîrin. Ew bû numûneyek jî bo gelên dîn, ku ew ji li materiyalêñ xwe yêñ weha kevin bigerin û derxîn ber ronahiyê...

Xasîma piştî şoreşa fransız û şerîn Napolyon, fikra "dewleta neteweyi" di nav gelên Ewrûpayê da yekser xurt bû. Hingê li çarali Ewrûpayê gelan dest pê kîrin berhemêñ xwe yêñ folklori ber-hevkîrin û nîvisandîn.

Pêsiyê li Balkanê (1820 yûnaniyan li diji Dewleta Osmani dest bî şerê serxwebûnê kîrin) û dûra li gelek derêñ Ewrûpayê tevgerên rîzgarixwaz rû dan û bî wextê ra gelek dewletêñ neteweyi yêñ nû hatin avakîrin. Dewleta Finlan-diya yek jî wan e.

ELIAS LÖNNROT Ú KALEVALA

Gelê Finlandiyâye, bi sedsalan di bin bandora Swêd û Rûsyayê da jiya-ye. Gelek caran dest guherandiye, ha-tiye parvekîrin. Van herdu dewletêñ serdest li ser erdê wê sinor kişandîne, li wir bi salan şerîn mezin kîrme..

Gelê fini, şiyarbûna neteweyi û dax-waza azadi û serxwebûnê bi sloganâ "Em nikarin bibin swêdi, em nax-wazin bibin rûs, bîhêlin em wek xwe finlandi biminin" diani zîmîn. Dî pey-dabûna tevgera rîzgarixwaz ya finlandi da, yek jî fenomenen sereke dr. Elias



Kaleva: destana heri zêde wênekiri ye...

Lönnrot (1802-1884) e. Ew bû yê ku stranên gelêri yên kevin kom kîrin û ji wan destana neteweyi Kalevala afirand (1835). Hînek niviskarê fini yên romantikê, zûda, ango beri Lönnrot dest bî komkîrina berhemên folklorî kîribûn. Wan beşek ji stranên Kalevalayê dabûne hev. Lê yê ku hertim di daxwaz û xeyala wi da, ji wan stranan pêkanina destaneke wek ya HOMEROS hebû, berhevkarê edebiyata gel yê xort E. Lönnrot bû. Loma dema Lönnrot li devera Karelya doktori dikir, di ber ra ji bî karê komkîrina folklorê va mijûl dibû û gelek stranên nû berhev kîrin. Lönnrot bî xwe guhdariya çirokbêj û dengbêjan dikir û dînîvisi. Pişti xebata yanzdeh salan ji stranên kevnare destaneke temam çêkir. Lönnrot, ji bo ku bikaribe bî pevgirêdaneye huneri stranan bî hev va gîrê bîde, gelek caran ji ber xwe hin tişt nîvisine û lê zêde kîrine.

Tema sereke ya destana Kalevala li ser şerê navbera du gelan Kalevala û Pohjola, û li ser serfiraziya gelê Kale-

vala ye. Şer li ser ronahiyê ye; şerê navbera qenci û xirabiyê ye. Dî pêş da serpêhatiya gelê Kalevala û qeder û serpêhatiya gelê fini xwe digihinîn hev û dibin yek. Büyerên destanê geh bî sembolên exlaqi, geh bî motifên neteweyi têñ nitirandin.

Elias Lönnrot, di xebata xwe da hemû cureyên edebiyata gel bî kar anije. Wi helbestên epiki û parçeyên liriki bî hev va girêdane, û hetta ci-ciyan stranên dawetan ji bî kar anine. Bingehê destanê bî girani li ser çirok û efsaneyên kevin hatiye danin. Lê wek şîer berhemeke sedsala 19-an e. Kalevala berhema fini ya yekemin e ku di edebiyata cihanê da ciyekî bî rûmet girtiye, û wek "Dazana serxwebûna kulturi" hatiye binavkirin. Rola wê ya diroki geleki mezîn e di çekirîna şîura neteweyi da. Dî şerê avakîrîna dewleteke serbixwe da moraleke zehf mezîn bû ji bo gelê Finlandiyâye. Ji xwe loma iro ev destan, destana heri zêde wênekiri (resimkiri) ye di dînyayê da.

EHMEDÊ XANI Û MEM Û ZİN

Sairê mezîn Ehmedê Xani bi nîvisandîna Mem û Zin'ê şaheserek afirandiye, ku mîrov dîkare wê ji wek "Dazana serxwebûna çandi û neteweyi" bî nav bike.

Xani M û Z li ser bingehê destaneke kurdi ya kevin, ango destana Memê Alan avakîriye. Wi dendikê çiroka evîna Memê û Zinê ji vê destana folklorî wergirtiye û bî motifên kurditiyê



Elias Lönnrot (1802-1884)

Dema Kalevala cara pêşin hat çapkîrin,
Lönnrot 33 sali bû. Dûra bû professorê
zimanê fini li zaninge ha Helsinkiyê.

xemîlandiye. Bî vi awayi berhemeki folklora kurdi li gor qaideyên estetiki yên çaxa xwe, li gor şêweyê destanên rohilati, bî awayeki manzûm nîvisiye. Nîvisandina destaneke manzûm bî zimanê kurdi yek ji armancê wi yên heri pêşin bûye. Xani xwastiye beri hertiştî nişani dînya-alemê (herwisa gelê kurd û şairên kurd yên ku bî zimanê biyani dînîvisandin ji) bîde ku kurd ji dikarin bî zimanê kurdi eserên mezin wek destan bînivisin.

Destana Ehmedê Xani M û Z bangazadi û yekitiya milletê kurd e, dî wir da nîvîkar doza dewleteke kurdi dîke, loma bangi qebile û eşirên kurd dîke kû bibin yek, pesnê mîrxasên kurdan yên berê dîde, li diji dewletên dagırker Osmaniyan û Eceman ala serxwebûnê bîlind dîke, rûmetê dîde çand û toreyen civata kurd, bî şairên kevin wek Melayê Ciziri, Feqiyê Teyran û Eli Heririiftixar dîke û hwd. Jî hemû van

tiştan xweş diyar dibe ku Xani we lathizeki mezin e.

Dî sedsala 17-an da, ramanê nete weyi yên bî vi rengi ne tenê li Rohilatê herwisa li Ewrûpayê ji hina aktûel nebûbûn. Romantikê wek tevgereke kulturi û siyasi hina dest pê nekîribû. Loma mîrov nîkare yekser iddia bike ku dewleta neteweyi û nasyonalizma ku romantikiyan (100-200 pişti dewra E.X) qest dikirin û ya E. Xani wek hev bûn. Mesela dewleta ku E. Lönnrot ji bo avakırına wê dixebeitî û ya ku dî hisê Xani da hebû ne wek hev bûn. Yek monarşî bû ya din cumhûriyet. Ev tişteki tabii ye. Lê dervayı vê, ideal û kîrinê wan - digel ferqeke zeman ya 150 sali- wek hev in: E. Lönnrot ji wek E. Xani ji folklora gelê xwe çirokek mitolojik kîriye bîngeh ji bo destaneke neteweyi, herdulan ji rûmeteke mezin dane zimanê gelê xwe, li diji hegemonya dewletên ciran sekînine, doza xwe-xwetiyê û serxwebûnê kîrine. Loma em wîsa bawer dîkin disa ji wê ne şaş be eger mîrov ditinê Ehmedê Xani wek romantizm, yan ji nasyonalizmeke zû bî nav bike.

Destana M û Z û bir û baweriyê Ehmedê Xani hê iro ji bî qasi ku pêwist e ji ali pîrr kesan va baş nehatine enanekîrin û têgîhiştin. Lê disa ji ew dî çêbûna şîura neteweyi da û dî şerê rizgariya gelê kurd da hêzeke jîndar in.

Em gotina xwe bî pîrsekê kuta bîkin: Me got Kalevala ji ali resman va destana heri dewlemend e. Lê çend wêne ji bo destana me ya neteweyi hatine çekirin? Bî qasi ku em pê dizanın, nigarîn destana M û Z ne gelek in. Gelo hunermendên kurdan cîma hewlnadin ku jê ra çend desen û tabloyên baş çenakin?..

Hunermendan piştî hostayeki muzika kurdi weha gotin:

Tehsin Taha wê dî muzika me da herdem bîji!

Dema stîranbêjê gelê me yê hezkiri Tehsin Taha çû ser heqîya xwe, hingê hejmara çûyi ya kovara Roja Nû dî çapxanê da bû û me xwe pêra negîhand ku em lî ser binivisin. Lî nuha hineki dereng ketibe ji, di vê hejmarê da em ê lî ser jiyana Tehsin Taha, lî ser xebat û berhemên wi mesaj û nîvisarên çend hunermendêne me bîweşinîn. Em stîranbêjê mezîn Tehsin taha bî rêz û hurmet bî bir tînîn. Ew ê di çand û muzika gelê me da bîji

ROJA NÛ



Tehsin Taha (1941-1995)

Hunermend, stîranbêj
Seid Yûsif:

Bî dileki pîr bî hesret,
ahin û keser ez vê
mesajê bo wan kesen
hunerhez û ahinkê
barkırına hunermendê

hêja Tehsin TAHA rê
dikim. Ev hunermendê
bî hest û balkêş, bî
barkırına xwe jî vê
dunyayê, wi ciheki
mezîn vala hîşt. Ez ne
bawer im ku hunermed
karîbin wi cihê vala
dagrin! jî ber ku xwedâ

lê xweş bê kek Tehsin
Taha riyeke wi taybeti
hebû ta vê kîlikê tu kesi
bî kar neaniye. Wesan
tu kes cihê kesi nagirê.
Xweda wi bî rehma
xwe şabike û emrê dîrêj
bîde bîçûkên wi. Ez
hêvidar im ku her sal bi-

ranina vi hunermendê mezin li her cihî çêbîbê û pêkwerê. Dîgel vê ji ji bîçûkên wi re ji alikari-ye k hebe. Hûn xweş û serê we sax be.

Seid Yûsif
Stockholm

Hunermend, stranbêj Cûdi:

Bî dileki şikesti mîn reşxebera koçkırına hunermendê bî nav û deng Tehsin Taha bihist. Ji nêzik ve mîn ew nasnedikir. Lî belê mîn ew pir ji nêzik ve nasdikir bî awaz û gotinêni wi ve . T. Taha yekemin hunermend bû yê ku karibû rewşa evina xwe û evina welat, dî stranêni xwe de bîde xuyakîrin. Dema ez hinbûm stranan, mîn geleki gohdari dengê wi dikir, û gelek ji awazên wi mîn bî kar tani. Dî wê demê de gelek ji hevalên mîn ji mîn re digotin dengê te pir nêzi dengê T. Taha ye.

Helbestyan Mueyyed

Teyib:

Lî roja 28/5, siwarekê qada stîrana kurdi, hunermendekê dahêner û kurdperwer, yê ku pitir ji 30 salan bî deng û awazên xwe yên rengin



■ Dî wêneyê da: Tehsin Taha digel S.Yûsif û B.Botani

xem, jan û hêviyên me dîkîrine stîran û bî wan stîrana carna birinêne me dikewandin, carna hêşirêni me dîbarandin, lî her tim canê me bîlind dikir û dilê me tiji hêviyên pêşerojeke geş dikir, peya bû.

Lî roja 28/5 vi swarê pêşeng dûr ji çiyayêni Kurdistanê, dûr ji Sûlav û Kela Amediyê, dûr ji dengêni pêlêni Xabûrê û Zê, xatira xwe xwazt û

Kurdistanê dîquta heta hetayê rawestiya.

Tehsin Taha, ki ji me heye dema dengê wi dîbihize,

"Bêrivanê"

"Ay felek"

"Bûka Kurdan"


"Bihêre destar"

"Karwanê me"

"Xewn"

"Ho beriyê"

û bî dehan stîrana wi nahêne bira xwe?



Mueyyed Teyib

dilê wi yê serê 55 salan xwe bî cîsqâ kurd û

Tehsin Taha, ki ji me heye, dema dengê wi dîbihize, bî dehan birhatinêni xweş û nexweş nahêne birê? Tehsin Taha ew hunermend bû, yê ku hemû ew saxletêni

hunermendeki zindi dîkin û ciyekî kûr û fireh dî diroka hunerê gelê xwe de dîhêlin, li cem hebûn.

Tehsin Taha dengekê kûr, xemgin û nebez bû. Muzikeka nûjen û resen bû. Zimanê dîlê gelê xwe yê bîndest û xweragir bû.

Tehsin Taha, mirovek bû ne serê xwe bo gefên Sultani şor dikir, ne devê xwe bo xweş-xweşkên wan beş dikir. Guman nine, hunermendekê bî vê behrê, bî van saxletan, bî vi navi û bî van nişanan, dê ciyekê gelek kûr û fireh dî dîlê gelê xwe da hêlit şüntiliyên wi heta demekê pîr dirêj dê dî diroka strana kurdi da aşkere û xoya bin. Taha hunermendek bû, rîz û hûrmeteka bê sinûr jî folklorê xwe re digirt.

Tehsin Taha, hunermendek bû, xwineke nû da stiranakurdi. T. Taha ew hunermendek bû yê ku em jî davên stranên erzan ên biya-nîyan azad kîrin û berê me da nav mîrg û çimenên strana kurdi ya şîrin.

Tehsin Taha, hunermendek bû, gelê wi dî dîlê wi da diji, lewra iro ew ji dî dîlê me da dîpjî.

Her weki çi cara û li çi ciya sinûr neşyaye, nikariye rê li hunerê bigrin, her weha ji ew ên ku sinûrên welatê me perçe kîrin neşyan rê li

deng û awazêن Tehsini bigrin û dengê wi li hemi welatê me belav dibû. Lî mixabîn li çi devera weki devera Behdinan delive helnekeft ku hemû xelkê jî nêzik Tahay bîbinin û nas bikin.

Tehsin Taha bo me li wan şevêñ reş û dirêj ên rejima Bexda weki xetireka ges bû. Em bî şewq li benda stiraneka Tehsin Tahay bûn. Her stiraneke wi ya nû wekû birûskekê deng vedîda û qonax bî qonax serkeftin û şkestinêñ gelê me dianine ziman.

Sala 1974-an bû, Kurdistan dî agirê kerb û kîna rejima faşista Bexda da dikeli. Bajaren Kurdistanê niv vala bûn û ew ji ji sitema rejimê dikelyan. Tehsin Taha hate Dihokê û ahengek gêra. Bi qasi hejmara xelkê Dihokê yên hatine wîr ew qas polês ji hebêñ û zêrevani li xelki dikir. Ez laweki 17 sali bûm û wê rojê ez ji yê li wêre amadebûm. Tehsin Taha hate ser sehnê ji destqutan gaziya avahi hejya, sehmê serê polêsa girt. Tehsini bê tûs qerkire stirana:

*Ey felek bo te dinalim,
bo çi nêrgiz çirmisi?
Ew çîma bextê me hoye,
em bê dost û bê kes in?
Agirê sar û vemiri, çav
me lê ye ges bibit.
Ew buhaba têhnê kuştı,
hêvidar im xweş bibit.*

Pâşê stîra:

Bihêre destarbihêre!

Xemêt me gelek gîran in
Dengê destari axin û
nalin e,
Ax û fixan û hawar in.

Ew kesê wê rojê li wê ahengê amade nebûy, zehmet e bizanit Tehsin Tahay çi hîner kir û çawa wekû qehremaneki li singê dîjminan rawestiya û tiji serê wan sehm kir û dilê me tiji hêvi kîrin.

Piştî wê ahengê, êdi her ahengeka Tehsin Tahay digêra wekû xwe pêşandanekê diji rejimê lê dihat.

Tehsin Taha wekû kurd û wekû hunermend, jîneke gelek sext û dijwar derbas kir, lê di heman wext da jîneke gelek bîhagiran û pîrwate...

Yek jî suxriyetên qederê ye, ew Tehsinê hemi dema bî hezaran xelk li dewr û berêñ xwe didit, beri çend rojeka bî tenê, li ser textê nexweş-xaneyekê li weliteki xerib, çavêñ xwe heta hetayê danane serêk. Lê eger Tahsin dî mirina xwe da yê bî tenê bû, guman nine dema tabûta wi dîgehe "Brehim Xelil" dê bî hezaran jî aşiqêñ dengê wi, wî bî gul û nêrgiz û rondikan pêşwazi kin û dê bî hezaran li dewr û berêñ wi bin dema axa Kurdistanê wi hembêz dike.

Tehsin serê xwe bî dileki rihet û tena dane!

Peymana te gîha!

2/6/95

Hunermendê nemir Tehsin Taha

Ew li 25.5. 1941 li Batûfê-Zaxo hate cihanê. Ew jî heft saliya xwe distira û ji hunerên dengbêjên Botan xwe werar kîr (Pêşxist). Lî destpêkê, lî xwendegehê û şahiyên biçûk distira. Dema ew bû hejde sali li ahengek besdar bû û ji evina huner û cemawerê kurd yê germ, wi bi coşî programa xwe pêşkêş kîr. Hîngê xudê lê xweş Tehsin Tahayi gelek rexneyên wi li helbestêñ kurdî hebûn. Jî ber hîndê wi dixwest ku guhartinek li helbesta kurdî bête kîrin. Lî wi li gor şiyana xwe awazên tekûz, coş û xweş jî helbestêñ kurdî ava dikîrin û morka xwe ya taybet pê xurt dikîr. Hema jî ber vi karê hîja ewi baş xwe pêşxist û ji alîyê cemaweri ve hate pejîrandin. Heger em stîra na wi şî bikin, dîbinin ku ji pesteya kurdî hatiye û ji sê yan çar awazîn rengin hatiye avakîrin, bi parçeyeka muziki û hewayek hatiye xemîlandin. Ewi bi dengeki nerm û zelal distira û bala cemaweri dîkêşande ser xwe û bi taybet dema dî gel hunermenda mezîn Gulbuharê distira.

Dema ez xort bûm, min gelek stîranêñ folklori dane kek Tehsini û wi ditîna xwe li ser stirana folklori got ku "stîraneka bi sinûr e û têr na kit, di gel vê ji bi kêmahiye". Paşê got ku "Ez tenê li peyvîn nû dîgerim ku bi wan bisêm bersîva dema xwe bîdîm". Edî jî bo hunera kurdî ya nû, nemir Tehsin Tahayi gelek xwe westand û di demeka kurt da gehîste armanca xwe. Dengê wi li hemû deveren welêt belav bû. Wesan li gor xwestina cemawerê kurd û berpirsyarêñ huneri û çandi, kek Tehsin Tahayi carna stîranêñ folklori bi deng û ûda xwe belav kîr û ew kasêt ji min ra hate pêşkêşkirin.

Hîja Tehsin Tahayi, bi çaveki bilind li dengbêjê nemir M. Arif Ciziri dinêri û gelek rûmeta wi digirt. Dema Ciziri ji nav me bar kîr, niviskarê hîja Sekvan Ebdîlhekimi berhevokek bi navê "Kewê Rîbad" nîvisi û di wê berhevokê da kek Tehsini ji ditîna xwe li ser M. Arif Ciziri got ku "M. Arif Ciziri seydayê min e û heke ew ne ba Tehsin Taha

nedibû".

Dî gel vê ji ji bo biranîna yekê ya stîranbêjê bi nav û deng M. Arif Ciziri çend hunermendêñ hîja stîranêñ xudê lê xweş bi dengê xwe gotin. Jî wan stîranbêjan Kek Fuad Ehmed, nemir Tehsin Taha, Salih Amêdi, Ehmed Zêbari, Miran Herki û h.d.

Jî bo pirozkırına cejna Newrozê ya 1994, xudê lê xweş Tehsin Taha û hunermend F. Ehmed pêkve hatine Swêdê. Van du hunermendêñ mîhvan ji mirê tenbûrê Seid Yûsifi xwestin ku ji wan ra tenbûr lêbide. Kek Seid Yûsifi ji programma wan bê supas û bê xelat coş û xweş kîr.

Piştî ahenga Newrozê li Stockholmê kek T. Taha nexweş ket. Paşê li çend bajarêñ Swêdi ji bo vejandina ahengen Newrozê bes-dar bû. Paşê çû Hollandê û li wê derê disan nexweş ket.

Lî roja 29.5.1995 nûçeyeka nexweş gehîste me ku dilê hunermendê mezin T. Tahayi rawesta. Ew ji piştî ku bêhtir ji salekê û du heyvan nexweş ketibû. Ew nûçê li vê cihana mezin û bi sevekê belav bû.

T. Taha dengek ji dengek kurd û Kurdistanê ye. Ew dî his, can û dilen me da nemir e.

B. BOTANI

3.6.1995

Çend gotinê bijarte...

Herkesi kılamên kevn bigota
yeke teze çênedibû.

KEMAL BURKAY

Dizê piçûk bî zincir û ben e,
dizê mezin tac û temen e.

KEMAL BURKAY

Riya şaş, ha berjêr ha kaş.

KEMAL BURKAY

Rexne xwesiya hunerê ye.

ROBERT STORM
PETERSEN

Yê ku qet kareki nake herdem
meşxûl e.

GOTINEKE PESİYAN YA
SWÊDİ

Eger tu tiştên ku jî te ra ne
lazım in bikiri, wextekê şûnda
icar tê dest pê biki yên lazım ji
bifroşî.

BENJAMIN FRANKLIN

Pesin tişteki wîsa ye gereke bê
qezenckirin; şeref ji ew tişt e
ku gereke qet neyê winda
kîrin.

ARTHUR SCHOPENHAUER

Her kesek xwediye azadiya
xwe ye, bes eger wê bî kar
neyne.

HELGE KROG

Em nivê jiyana xwe bî
rastkirina dinitiyênu ku dê û
bavênu me hini me kîrine,
derbas dikin, nivê din ji em bî
fîrkirina zarokênu xwe bî dini-
tiyênu xwe, derbas dikin.

I. GOLDBERG

Yên ku zelal dînîvisin xwendê-
vanênu wan hene; yên ku şêlû
dînîvisin rexnevânênu wan
hene.

ALBERT CAMUS

Fîkîr ji wek zarokênu bîçûk in.
Mîrov bêtir ji yên xwe hez
dike.

MOA MARTINSON

Tu teyrek ji hedê xwe zêdetir
bilind nafire, eger bî baskênu
xwe bifire.

WILLIAM BLAKE

PEXŞANA KURDİ YA HUNERİ (2)

Ferhad Shakely

Şakir Fettah (ji dayikbûn 1914) di novelên xwe da pirs û kêmaniyêن civata serdemâ xwe tine ziman. Wi dixwest ku armanca mamûrên dewletê yên meqamên bilind derxe meydanê û nişan bide ku çawa bi riya ruşwetê pere bi dest dixin û diziya xelkê dikin. Wi dixwest ku rûyê serokên dini (şêx û meleyan) aşkera bike û derxe meydanê ku çawa ji bo xapandîna xelkê û nezanmayina wan din bi kar tinin. Di novelên din da ew jiyana insaneki belengaz û bêkar tine ziman yan ji zewaca kevneşopi dide dest, ku çawa mér û jin heta roja dawetê hevdû nabinin. Ew digel reforman e lê di çarçeveyeke dini da. Di şerê navbera başi û xirabi da rola Xwedê û dadiya wi ya esehi heye. Kesên gunehkar têr ceza kîrin û yên pak têr perû kîrin di dawiyê da. Şakir Fettah berhevokeke novelan weşandiye, "Şabanga Beroj" (1947) a ku ji deh novelan pêk tê. Ligel novelan, wi gelek nivisarên din ji nivisiye û weşandiye.

Merîv ji novelên Aladdin Seccadi (1915-84) têdighiye ku ew di civata Kurd da baş

bî cih bûye û jiyana rojane yên gund û gundiyan baş nas dike. Seccadi bî şêweyek zireki nişan dide, ku çawa di sistemeki wek Iraqa berê da hemû zordest û rêvebir alikariya hev dikin : polis, serokê polisan, serokeşirên koçeran û serokeşirên bî cihbûyi. Ew nişan dide ku çawa barê zulm û neheqi dikeve ser milê xelkê jar û belengaz û gundiyan. Çawa ew ji jiyanekei insani bêpar hatine hiştin. Seccadi xwedi çareseriyekei temam nine, lê bûyeran bi awayekî wîsa zireki didomine ku, xwendevan, heta nivxwendevan ji bî pêşketîna novelê gav bî gav dihise, wek ku niviskar di dilê wan da peyda bîbe. Xwendevan dîgîhiye encameki vekiri û temam di dawiya novelê da. Mijareki din ê ku pîr caran li ba Seccadi diiyar dibe cesaret û mîrxasiya gelê Kurd e, derbari têkoşerek politik an ji qehremaneki ku di nav eşira xwe da naskiri ye û bî toreyên xwe yên bilind va gîredayı ye.. Di novelên "La Pénawi Afrata" û "Cewher Axa" da bî awayekî romantik qehremani, bêtirsi û ajotina huner

nişan dide. Seccadi dî 1960 da novelên xwe di pirtûkeki da berhev kîr û bî navê "Hamişa Bahar" weşand. (25)

Yê heri radikal Ibrahim Ahmed e. Nove-lên wi, wek ên Seccadi li gundeki û li dorhêlên rênberan derbas dibe. Ew hev-nasiya ku Seccadi bî jiyana gundiyan ra nişan dide, li balê nayê ditin. Nîvîskar dî novelên xwe da behsa saziyên dewletê û pi-sitiya mamûrên biçük û mezîn, jînên reben û bindest, hevkariya navbera serokê poli-san û feodalân dîke. Berevajiyê Fattah û Seccadi, Ibrahim Ahmed çareseriye kû piri caran dî dawiya novelê da ji ali qeh-remanê novelê tê gotin destnişan dîke. Çareseriye wi radikal in. Ew bî lihevhatinê nîvcû bawer nake. Dizane ku sistemeki weha bî guhertîna mamûrekî pis gelac, yan ji dî şûna wi mamûrê da bî des-tê insaneki bindest rast nabe. "Ava çavkaniyê şoli ye û xani ji bingehê xer-abûye. Ji bo paqîkîrina avê û ji nû va avakîrina xani, xebateki organizekîri yê bî hevra û bî rik pêwist e, milê insanên baw-ermend û zirek lazim e". Evya encameke gundiye ki feqir e dî novelek Ibrahim Ahmed da. (26) Ew qehremanen renctitî yê novelên I. Ahmed, ji ber tade û zulma ku ditine, derheqa sedemên rewşa ku ew tê da dijin têghihiştî ne û ji ber vê yekê ji encame-ki zelal jê derdixin. "Sedemê hemû eş û derdan, hemû zulm neyekbûna me ye, nez-anîya me ye û bêkêriya me ye..." (27) Ibrahim Ahmed dî sala 1959 da novelên xwe berhev kîr û bî hevra weşand.

Kovara Hawar, ku li Şamê derçû, ji ber sedemên politik yê Sûriyeyê dî sê pengavan da derket. Hejmar 1 heta 23 dî navbera Gulana 1932 û Tirmeha 1933 da der-keit; hejmar 24 heta 26 dî navbera Nisana 1934 û Tebaxa 1935 da derçû û hejmar 27 heta 57 dî navbera Nisana 1941 û Tebaxa 1943 da derket. (28)

Wek kovara Gelawêj, ji bo kultura Kur-di Hawar xwedi buhayiyek bilind e. Nîvîskarê Hawarê ji, wek nîvîskarê Ge-lawêj herdu rîyê pêşketina novela Kurdi hilbijartîn, lê bî zanebûn û hedefek kêmîtir. Ew herdu rê, bî xwe nîvisandin û ji zimanê biyani wergêrandin bûn.

Pengava sêyem a kovarê (1941-1943) dema ku hunera çiroknivisinê bête pîrsin,

ya heri dewlemed bû. Ew çiroknivisên gîring ên ku dî vê serdemê da nîvisin, Qedrican (1916-1972), Bîşarê Sagman, Fuad Cemil Paşa, Osman Sebri (ji day-ikbûn, 1905) û Nûreddin Zaza (1924 - 1988) bûn.

Osman Sebri di çirokên xwe da bûyerên cuda distine dest, dî nava vana da baweriya bî cin û periyân ên nava civata Kurd bî awayeki hiciv dîde nasin. Wek minak, baweriya ku şeytan kare mîriya vejîne û wana bîke insanen xirab û dilkevir. Heta wîsa bîke ku merîvîn wi ji jê bitîrsin û bîrevin. Dî çirokên din da yan şerê azadi ya Kurdan yan ji kevneşopiyen nêçirê yê Kurdistanê tine ziman.

Dî nav çiroknivisê Hawarê da yê ku zê-detirin bî zanebûn dinivise û hewl dîde ku ji hevalbendêñ xwe nûjentir binivise Nûreddin Zaza ye. Ew yê heri afîrandêr e. Naveroka novelên N.Zaza dî navbeyna du qutuban da diçê û tê : Sadîqbûna Kurdan dî şerê azadiye da û têkoşina bo perwer-deyi û zanîn, bî taybeti ji bo nifşa ciwanan. Dî novela "Xurşid" da, gundiye kurê xwe bî awayeki nûjen perwerde dîke û ji bo perwerdeyiye hemû tiştî dîde ber çav. Piştî mirîna kurê xwe ji, ew jiyan û hebûna xwe dîde ser perwerdekîrina zarokên gund û bî melayê gund ra vê xebatê didomine. (29)

Dî novela "Gulê" da behsa jîneke ku bî zordayinê didin mîr dîke. Ji ber ku jînik ji mîrik hez nake, rojekê wi dîkuje û bî mî-reki dîn ra direve, wek eşqiya li çiya diji. Gundi heqaretê lê dikin û wê jîrêderketi, bêar dibinin. Hetta mîrê wê Qoco ji lê dixe lê tevi viya ji jînik ji mîrê xwe hez dîke û li balê dimine. Ew bî vi awayi çend sal bî hevra dijin. Rojekî dema ku dijmin êrişê navçeyê dîke, jînika me ya eşqiya dîbe qehremanek (wek sér) û dî şerê li hember dijmin da rîzaniya ciwanen navçeyê dîke. Bî şev dibinin (gundi) ku Gulê ji hêla dijmin derket û hat. Wê demê gundi dikevin şikê ku Gulê xayınti bî wan ra kîriye û rî nişanî dijmin daye. Niha ew zêtîr tawanbar dîbe. Qoco wê dîkuje. Şer berdewam dîke û Kurd cihê dijmin dixe destê xwe. Rasti aşkera dîbe. Serê sereske-rê dijmin tê jêkirin û ode di xwinê da dimine. Li ser doşekê xencerek zîvin.

Qoco xencerê digre. Xencera ku wi dabû Gulê. Dî nav kulma seresker da qevdek porê zer ê Gulê ba dîbe". (30)

3- Niviskarê Xelkê (1950 - 69)

Dî salên 1950 - 69 da gelek guhartinê politik çê dibin. Dî dawiya sala 1946'an da Komara Demokratik a Kurdistan a Mehabad hîlweşîya û ji bo tevgera azadi û çanda Kurdi nawendeke giring wînda bû çû. Dî dawiya sala 1940'i da tevgera azadi ya Kurd û hêzên dijber ên Iraqê li hember êrisen politik ên rejimê di parastinê da bûn. Rejim (a Iraqê) malbata Barzani bir rojhilate Iraqlê û serokê wan hebs kîr û tevi ku soz û bextê efuya giştî dabû ji, serbazên Kurd ên ku piştî ketîna Mehabadê vege riyan Iraqlê da dardakirin. Partiyê politik hatin girtin û serokên wan an hatin zindan kîrin an ji dardakirin.

Dî van salan da weşanên Kurdi ji ber êris û tevdîrê rejimê nîkaribûn derbiçûna. Kovara Gelawêj a ku deh salan çanda Kurdi teşwiq kîr û pêşve bir, di sala 1949'an da ji holê rabû. Berbi nivê sala 50 tenê rojnameyeki hefteyi, ku carna nîvisarê edebi dîweşand, rojnameya Jin hebû.

Piştî çend salên xwepâşvakışandinê li Iraqê tevgera azadi ya Kurd dest pê kîr û hêzên politik ên din ji bo şeriki nû xwe ji nû va organize û amade kîrin. Têkoşin û çalakiyan rejima monarşist a Haşimi ji xwe ra kîr hedef û giraniya xwe da vê xebatê. Hevkariya navbera partiyê dijber (muxalefet) di sala 1957 da giha encama Yekitiya Neteweyi.

Serketinê muxalefetê zor da rejimê da ku hin rojname û kovar ji nû va bêne weşandin. Dî vê navberê da di salên 1957 - 58 da kovarê Hiwa û Şafaq li ser çanda Kurdi xwedi bandoreke pozitiv bûn. Wergêrên ji edebiyata bîyani, di van salan da ji çê bûn. Berhemên giringtirin ên ku hatin wergêrandin, ên Voltaire, Shakespeare û Gogol (31) bûn.

Ser û dijberi monarşiyê ji hukim ani xwarê û di 14'ye Tirmeha 1958'an da di bin rîvebiriya Abdulkerim Qasim (1905-1963) li Iraqê komarek hate êlankirin.

Piştî rûxandina monarşiyê nispeten rejimeke demokratik hat ser hukim. Rejima nû mafê gelê Kurd bî qanûnê himi pejîrand û eyni mafê Ereban da Kurdan ji. Weşanên Kurdi legal bû û ket serdemeki nû ya azad.

Dî hersê salêni pêsi yên rejima nû da gelek rojname û kovarê Kurdi hatin weşandin. Dawiya rejima nispeten demokratik zû hat. Piştî cerîbandina gelek riyen aşiti û demokratik, tevgera azadi ya Kurd di 1961 da dest bî şerê çekdari kîr. Şerê azadi, ku di sala 1961 da di bin rîvebiriya Barzani da dest pê kîr, dîgel çend navbirêna bazariya çareseriye heta 1975'an dom kîr.

Ew bist salêni vê serdemê, ji bo novelên Kurdi salêni xweş bûn. Tiştê yekem ku bal dîkşine ser xwe, merîv di vê serdemê da dixweyne, bî awayeki vekiri hejmara novelistan bîlind dibe. Eger ji nîfşa Gelawêj tenê sê novelistên pêşketi hebûna, wê gavê di vê serdemê da bî hîndikayi wê deh kesen bî stil, ku bî berhemên xwe edebiyata Kurdi dewlemendtir bikirana, hebûna. Lî disa ji eyni hejmar, teqrîben deh kesen novelist (çiroknîvis) ên kîmtîr pêşketi hene. Çend kes ji wan bî temami zû dev ji nîvisandinê berdan.

Hîlbijartina mijarêni novelên vê serdemê ji yên serdemâ bori firehtir û bî naveroktir in. Ligel mijarêni kevneşopi ango mijarêni ku serdestê novelên salêni 40'i bûn, wek zordestiya ser gundi û jinan, mijarêni nû dertêni pêş. Novelist êdi li dorhêlêni rûniştvanê derkenarê şaran û gundiyan nesekinin û xwe berdan bajaran. Şerê politik û dijberiya rejimê û balkışandina ser pîrsa Kurdi ya neteweyi, ku him sedemeki zordestiyê him ji yê şer e, du mijarêni giring in. Mijara diroka Kurdi ji, mijareke giring e.

Sewiya huneri ya novelistan ji hev cuda ye : wek du minak, novelên ku Mustafa Salih Kerim û Cemal Nebez dînivisin ji se-wiyya nîfşa Gelawêj bîlîndtir in. Yên din formeki basit bî kar anin û carna novelên xwe tenê bî şiret û balkışandin kuta dikirin.

Serdema guhurina rejimê ya Iraq û ew salêni ku hînek azadi û demokrati hebû ji bo novela Kurdi dîviyabû ku bîlînbûna kaliteyek bî xwe ra bîaniya pêş, lê ev tişt

çê nebû. Ev guhurin a rejimê ji bo çapemeni, ji bo berhemên ku berê hatibûn nîvisandin lê ji ber sansûrê nehatibûn çap kîrin, rê vekir. Hilbijartina mijaran ji her wîsa wek xwe ma. Novelist ji ali rejimê va wek ku bî doşekê va hatîbin girêdan bê tevger man. Mijara nû bî tenê şoreş bû, komar bû û serokê yekta ê heyi bû." Sala pêsi ya piştî guhurina rejimê çend novel yekser behsa rejima nû û kîfxweşîya xelkê ya li ser "buhişta" çêbûyi dikîrin. Piri caran dî novelan da qehreman axaftinê xiretkêşi dikîrin û dî ber dilê xelkê didan da ku ew komara nû bi xwîna xwe biparêzin. Ev mijara nû, ji dervayî nîvisarêni siyasi yên bê cihana huner û estetik, tu novelên serketi dernexistin holê.

Muharrem Muhammed Emin (1921-80) dî novelên xwe jiyana feqirêni bajaran tine zîman. Ew di hin novelên xwe da gelek pîrsan bê bersiv dihêle - wek, cîma zilamek û jîna wi nişkava li dû hev dîmrin - û bêşik ev nuqtayeki qels ê nîvisarêni wi ne. (32) Dî noveleki xwe da bî awayeki bêqusûr li ser şîn û berketina ba Kurdekk û qereçiyek dîsekîne : herdu ji bê dewlet in. (33)

Muhammed Mewlûd (bî bernavkê "Mam") (1927-87), hîm li bajar him ji li gundan bî jiyana feqiran naskiri ye, û loma ji ew bî awayeki şahi karîbû wêneye cîvata Kurd bî aliyêن cuda bide nişandan. Grûbeki dîn i ku dî novelên wi da cih dîgrin, xwendevan in û dî wan novelan da ya insanêñ feqir yan ji têkoşinêñ politik tê rawekîrin. Pîrsa neteweyi û şerê azadi ji, mijarêñ gîring in dî novelên Mam da.

Mustafa Salih Kerim (bûyin: 1931 -), ji yên dîn bî hunertir dînivise. Dî destpêkê da ji bo nîvisandinê wi mijara dorhêlîn gundi- ti hilbijart, lê aşkera bû ku ew jiyana warêñ weha nas nedikir. Dî gelek novelên wi da bûyerêñ dramatik dertêñ pêş, ku rengeki pozitiv nedîda novelan, lê Kerim wîsa bawer kîr ku bikaranina bûyerêñ weha wê bala xwendevan bikşine . Belki van novelan karîbûn xitabi xwendevanêñ salêñ 50 bikira. Dî novelâ xwe ya dîrêj a bî navê Şehidani Qalay Dîmdîm (Şehidîn Kela Dîmdîm) da, Kela Dîmdîm bî qehremani tê parastin û dî şerê azadi û serxwebûnê da, ku ev qehremani û kevneşopiya şerê azadi li ba pêşiyêñ Kurdan hebû, xwe feda dikin.

M. S. Kerim bî vi rengi dixwaze minakêñ pozitiv bîde nîfşen nû.(34)

Cemal Nebez (bûyin: 1929) bî navê "Lalo Kerim" tenê novelek dîrêj weşandiye. Nexwe ew wek zîmanzan û munaqeşevanê politik tê nas kîrin. Dî vê novela xwe da Nebez, jiyana gundiyan ku di bin zordariya begêñ feodal da ne tine zîman. Mijar wek ê novelistên din e, lê disa ji novelek bî huner û serketi ye. Zîmanê novelê, Kurdiyeke edebî û paqîj e. Lî ew bî ser neketiye ku diyalogan bî zîmanê gundiyan bine zîman an ji pêşkêş bike. (35)

Cemal Baban (bûyin : 1927), wek novelistên din eyni rîyê hîldibjêre. Novelên wi derbari jiyana gundi û yên derkenar, cerbandinêñ huneri ne . Ew, zordestiya ser jînan ji tine zîman. Novela xwe ya dîrêj a bî navê "Xanzad", bî vê mijarê aniye pêş. (36) Novelên Baban ji ali huneri va qels in, û zîman ne zîmaneki taybeti bîlind e.

Kovara Şafaq, a ku di Çileya Paşin a 1958'ân da dest bî weşana xwe kîr, berpîrsiyariya pêşengîyeke giranbiha da ser xwe û di hejmara xwe ya duduyan da ji bo perûkirina sê novelan leceki êlan kîr. Seriya 30 novel di lecê da cih girtin. Diyariya yekem gihişt Huseyin Arif û novela wi ya "Çay Şirin". Bî saya vê lecê ev qabiliyeta mezin û nîviskarê afirandêr hate xuyakîrin. Heta ku H. Arif berehemek hêja çap kîr, bî ser vê lecê û hunera ku pêra derket holê gelek sal derbas bûn. Lî disa ji, ji 1970 vîrda H. Arif novelisteki rîza pêsi ye.

Dî destpêka 1960'i da ji Kurdistana İranê du novelist, xwe bî Kurdan dan nas kîrin, ango Hesen Qızılçi (1913 - 84) û Dr. Rahim Qazi. Dî serdema Komara Mehabad da Qızılçi, yek ji nîviskarêñ heri çalak bû. Piştî hilweşîna komarê wek nîviskar û siyasetvanêñ aktiv, ew ji mecbûr ma ji İranê derbasi Kurdistana Iraqê bîbe. Lî wê derê ji, Kurd di bin zulmê da bûn. Herweha ew li wi cihê xwe yê nû ji rasti dijwariyan hat. Jî ber tîrsa polêsên Iraqê bî awayeki nehêni (illegal) û dî bin naveki sexte da mecbûrê gelek karêñ cuda bû. Ev serbori, jiyana bî rev, birçibûn û jiyana binerd ji bo nîviskar bû materyaleke dewlemend da ku wana birêje, ango

binivise. Dema ku stil, ziman û forma hunerî bîkeve rojevê, Qızılci, jî hemû novelistên vê serdemê yê heri pêşketi ye. Ew novelên xwe bî pêkeniyekê rexnegir û karikaturi dinexşine. Dizane berê xwe dîde kijan armancı û bî ci awayî jî bo novelên xwe mijaran hilbijêre. Jî vi ali va meriv dikare wi bî Eladdin Seccadi ra muqayese bike, lê bî wê cudahiyê ku novelên Eladdin Seccadi bî hejmarêñ xwe kêmtir in. Noveleñ Qızılci dî 1972'an da wek pirtûk hatin weşandin. (37)

Rahim Qazi bî navê "Pêşmerge" bî tenê novelek dîrêj weşand, ku meriv dikare vê novelê wek roman ji bî nav bîke. Dî novela xwe da serdemekê nû hilbijart da ku wê serdemê dî diroka gelê Kurd da nişan bîde. Malbata wi bî xwe dî vê serdemê da roleke giring leyist û ew bixwe ji şahidê bûyer û qewimandinê navbera salên 1940 - 46 bû. Jî wan bûyeran, Komara Mehabad bûyera heri mezin bû. (38)

Dî nav çirokbêjêñ vê periyodê da meriv kare navên Kawûs Qaftan (bûyin: 1933), Muhammed Salih Seid û Marif Barzinji (1921 - 63) ji bîde. Navê dawi bî mijar û stilek nûceribandi derket pêş. Tevi ku berhemêñ wi yên çapkiri kêm in ji, meriv di wi da kare talangeki rasti his bîke. Mijara ku ew hildibjêre, gengeşya ol e û bî taybeti ji dezgehêñ şêxan in. Malbata wi li seranserê Kurdistanê naskiri ye û ew bixwe ji jî wê malbata naskiri ye, lê tevi vê rewşa wi ji, ew li hember şêxan dî nav tewreke negativ da ye. Barzinji, meriveki şoreşger û aktivisteki siyasi bû ji. Ew di 1963'an da jî ali rejima Iraqê hate dar-dakirin.

Piştî zulm û girtina Kurdêñ siyasi yên aktiv, qedexekirina Partiya Demokrat a Kurdistanê û girtina organa vê partiyê, soz û bextêñ rejimê yên bî dek û dolab ên derbari mafêñ Kurdan, dî llona 1961'i da li Kurdistanê şerê çekdari dest pê kir. Jî bo edebiyata Kurdi rewşeye dijwar hate meydanê. Hema bêje temamiya rojname û kovarêñ Kurdi hatin qedexe kîrin. Dî navbera salên 1962 - 66 da kovar an ji rojnameyek Kurdi yên serbixwe derneket. Lê disa ji, du-sê rojname û weşan ji ali liseya Sulêymaniye yan ji belediyeya Erbilê va hatin weşandin, ew ji salê hejmarek. Kovara

"Titûn" bî sê ziman hatin weşandin : Erebi, Ingilizi û Kurdi. Rojnameya Al-Axbar (nûçe, xeber) bî 8 rûpelan hatin weşandin û jî heşt rûpelan tenê rûpelek bî Kurdi bû. (39) Hejmara pirtûkêñ Kurdi gelik kêm bûn. Dî van pênc salan da tenê 39 pirtûkêñ Kurdi derçûn. (40) Jî niveka sala 1961 heta niveka 1967 tu novelek hêja ne-hate weşandin. Ev salêñ han dî diroka çanda Kurdi ya modern da salêñ heri tarîne.

4- Nîfşeki nû (1970)

Dî niveka salêñ 60'i da tevgera azadi ya Kurdistanâ Iraqê, jî ali eskeri û siyasi va bûbû faktoreke xurt ku hukumeta navendi ji nûkaribû hebûna vê faktorê bavêje pişt guhan. Dî 1964'an da ev tevgera han parçê bû, lê disa ji piştgiriyeke xurtbûyi ji xelkê sîtend. Ev rewş bûbû faktoreke hukumdarîyê û karibû li seranserê Iraqê tesir li siyasetê bîke. Jî bo hukmekê navendi şertê bingehin ew bû ku, tevgera rizgariya Kurd li pêş çavan bigre. Dî temamiya salêñ 60'i da hemû rejimê Iraqê bî Kurdan ra ketin bazari û danûsitendinê û banga agîrbîrinê kîrin, lê bî armanca ku hînek zeman bi dest xin û xurttir bibin. (1963, -64, -66)

Jî sala 1967'an şûnda rejimê Iraqê derbari Kurdan da siyasetek nû ajotin. Ev siyaset encameki bazari û hevditînê 1966'i bû û bî deklerasyona 66'an kuta bû. Şerê çekdari û derketinê çapemeniya Kurdi li navçeyen rizgarkiri, zor da rejimê da ku taviz bîde. Jî 1967'an şûnda jî bo hin rojname û kovarêñ Kurdi musade hate kîrin. Yen heri giring, kovarêñ "Birayı", "Ronaki", "Rizgari" û "Beyan" bûn. Bi van kovaran novelên Kurdi bal kişandan ser xwe. Hema bêje tu hejmarek bê novel derneçû. Çend novelistên modern ên Kurd cara pêşî di van kovaran da derketin pêşberi xelkê, wek minak Ahmed Muhammed Ismail, Raûf Hesen, Sadraldin Arif. Dî vê serdemê da çend berhevokên novelan ji hatin weşandin, ku him bi nave-roka xwe him ji bî forma xwe pêvajoya edebiyata salêñ 50 û beri sala 60'i bûn. Dî çend novelan da meriv kare hin ceribandinê modernizekirinê bibine û li

aliyekî bînivise, lê ew cerîbandinê bêkêr û destelepki bûn. Tevi çap û berê xwe yê si-norkiri ji, dî destpêka sala 1970 da li Kurdistanâ Iraqê ev xebatê han çalakiyên kulturi li dara xist û ji bo teqina çandi şert û zirûf afirand.

Rejima nû ya Iraqi ya ku di sala 1968'an da hukum kîr destê xwe, wek pêşen xwe, ihtiyaciya wan bî qezencirîna zeman û ewiqandinê hebû û lewra ji di niveka sala 1969' an da dest pê kîrin û bî tevgera Kurd ra ketin civin û hevditinan. Encameke gîring a van hevditinan peymanek aşitiyê bû, ku ev peyman bî navê "Peymana 11'ê Adarê" tê nas kîrin. Peyman him ji ali siyasi him ji ji ali çandi va, peymaneke gîring e. Ji bo serdemek nû ya kulturi destpêkek destnişan dike.

Ji bo pêşveçûna edebiyata Kurdi du feomenên jiyana çandi ciheki gelek giranbiha digrin.

a) avakîrin û ji nû va vejina saziyên kulturi yên Kurdi, wek minak Komela Nîvîskarêne Kurdi, Akademiya Ilm û zaninê, Şiretgeha Perwerdekirinê, Komela Çandi ya Kurdi, Weşanxaneya TV ya Kerkükê, Beşa Kurdi ya Zanineha Bexdad û Sulêymaniyyê...

b)Bî hejmarek gelek mezîn weşana rojname û kovarêne Kurdi yên ku bî gelek mijaran valahiyek dadigirt. Herwisa ji bo rîxistinê kitlewi ji destûr hate dayin, wek minak rîxistinê xwendevanan.

Ev rewşa nû ya siyasi û kulturi bibê nebê li ser edebiyata Kurdi tesir kîr. Nîvîskaran di çapeke mezîn da dest bî nîvisandin û weşandinê kîrin. Bî dehan şairêne ciwan û nîvîskar cara pêsi dî vê serdemê da derketin pêşberi xelkê.

Hêj di bîhara 1970 da xwendevanêne Kurdi him di şîer him ji di nesir da rasti pêleke xurt ê modernisti têne. Ev tevgera modernisti bû sedemê gengeşeyeke edebi di rûpelên rojnameyan da û di şev û semine-rîn edebi da. Jiyana kulturi ya Kurdi tu car gengeşeyeke weha xweş û hêja li xwe neborandibû. Gengeşî derbari pîrsen bingehin ên edebiyatê û teoriyên derheqa van pîrsan da bû, modernizm û berevajiyê wi klassizm, rewşa mirat û bermahiyên folklori yên kevn û edebi, texlid û ilhamîn ku ji edebiyata bîyani hatîne wergirtin, sembolizm

û berevajiyê wi realizm û pîrsen weha... Dijber û parêzgerê nîvîskarêne ciwan li ser nîvisarêne çapkiri munaqeşeyeke jîndar kîrin. Ev munaqeşeyen han demeki dûr û dîrêj ajot û gîhişt wê encamê ku nîfşa nû ciheki qewi girt û piştre ji hate pejîrandin.

Tevgera edebi ya 1970'yi ji nûkîrina form û naverokê pê dihat, lê hejmara nîvîskarê nesir ewqas zêde ninbû. Nîvîskarêne ku ji berê va hebûn bî awayeki nû û qewetek nûkîri dest bî nîvisandinê kîrin. Merîv kare di nava wan da yên aktiv û yên ku xwe wek pêşengê nîfşa nû dîditin, pênc - şes navêne ku beri sala 1970 xwe nedabûn nasandin bibine.

Hejmara berhemên çapkiri bî awayeki xurt bîlind bû. Ev rewşa gîredayi çapkırına gelek rojname û kovarêne çapkiri bû, û imkan û mecalâ çapkırın û weşandina pîrtûkên zêde bû. Ev nîfşa nû, ku wek "nîvîskarêne 70" ji têne bi nav kîrin, hêj ji xwedi roleke pêşengiyê ne.

Salêne 1975 - 78 ji bo kultura Kurdi paşvaçûnek bû. Ev paşvaçûn, ji ber zordari û sansûra rejimê bû. Rojname û kovar ne-hatin qedexekirin, lê li ser nîvîskarêne Kurdi zordariyeke wîsa çêbû ku ew nikarîbin bî azadi bînivisin û ditinêne xwe binin zîman. Weşanêne Kurdi bî nîvisar û wergîren ideo-lojiya Partiya Baas hatîn dagirtin. Ev, ji bo kultura Kurdistanâ Iraqê çar salêne têkçûnê û binketinê bû.

Cend nîvîskar ji vê nîfşa nû ne. Hînek ji wan beri sala 1970 derketibûn pêşberi gel, ya wek forma pîrtûk yan ji bî novelên serbixwe yên di rojname û kovaran da, hînek ji piştî 1970 derketin pêş. Nîvîskarêne nîfşa nû di nava xwe da ne komike homojen bû û ne nehomojenoya wan gîredayi pîrsen derbari temen, tema yan ji forma nava berhemên wan ninbû. Tîstê ku wan digihine hev xebat û cehda wan a nûjenkirine novelên Kurdi û bî naverokek nû ceribandina formen nû bû. Dî eyni wextê da ev nîvîskarêne nîfşa nû wek nove-listen nîfşen kevn dihatin xuyan (wek nîfşa Gelawêj yan ji yên salêne 50). Hînek ji wan hewl dan ku xwe nû bikin û bala xwendekaran bikşinin ser xwe, wek minak Mustefa Salih Kerim.

Ev modernizekirin ji aliki va gîhişt afirandina berhemên nû yên serketi û şiklê

gotin û nivisandinê yên kevn hate terk kîrin, ji aliki va ji hînek niviskar texlida edebiyata Ewrûpi kîr, ku ew berhemên Ewrûpi ji zû va li Ewrûpayê bûbûn aktuel, lê ev niviskar pîr dereng dest bî xwendina wan berheman kîr. Loma ji nivisarêن wan ji bo xwendekarêن Kurd biyani dihatin xuyan û xitabi karekter Kurdi nedikir. Bêguman beşek ji van niviskaran berhemên baştir pêşkêş kîrin û stila xwe ya edebi ditin.

Dî vê seredemê da navê heri naskiri Huseyin Arif (bûyin : 1936) e. Ew dî sala 1958'an da bî leca ku kovara "Şafaq" organize kîr derket meydanê û di wê lecê da novela wi ya bî navê "Çay Şirin" bû yekem. Ew bî navê "La Kori Xebata" di 1959'an da komeke bîçûk ên novelan weşand. Pirtûk, ku ji çar novelan pê dihat, nivisareke siyasi bû û jindariyek da xelkê Iraqê. Heta destpêka sala 1970 H. Arif çend novelan (hejmarek kêm) di rojname û kovaran da weşand.

Ku Huseyin Arif çirokbêjeki zirek bû cara pêsi di salêن 70 da hate nas kîrin. Ew yek ji wan niviskaran bû ku ji destpêkê va bî xiretkêsi dî munaqeşeya nûjeni û modernizmê da beşdar bû. Wi serpêhatiyen bixwe ji weşand, ku yek bî yek berê pirs û munaqeşeyen zêtir kîr. Piştî sala 1970 H. Arif sê berhevokêن novelan, romanek, pirtûkek li ser hunera çirokbêji, ligel bibliyografyayeki bî dehan nivisar û wergêr weşand. (41)

Novelên Arif, ku ez li vê derê didim pêşkêskirina yên din ên ji eyni nifşê ji, bî gelek awayan ji novelên nifşen borî vediqete. Büyera pirtûkên wi zêtir li bajaran derbas dibe û qehremanên sereke ji çin û tebeqeyen cuda têن. Evya gava pêsi ye ku Arif davêje da ku ji mijara kevneşopi ya ku di salêن 40, 50 û beşeki sala 60'i da serdest bû dûr bîkeve, jê veqete. Arif pî ri caran di novelên xwe da wek qehremanê sereke Kurdeki modern û intelektuel hildibjêre. Hilbijartına intelektueleki, imkan û mecal dide niviskar da ku qehreman karîbe xemên dîlê xwe rawe bîke û li ser pîrsên filozofi bifikire. Ne tişteki zehmet e meriv fam bîke ku novelist bî riya qehremanên xwe raman û hîzrên xwe tinin ziman.

H. Arif di novelên xwe da ji mijara seksê

nareve. Dî hînek novelên wi da seks, parceyeke jiyanâ rojane ye ji bo insanan, dî hînekêñ din da mijara sereke ye û ji bo kîryarêن insanan wek hêz û qeweta esasi tê pêşkêş kîrin.

Lî ba Arif û novelistên din ên vê nifşê, şerê azadi ne wek ên salêن 40 yan ji 50 ye. Qehremanê novelên siyasi yên salêن 40 û 50 li diji begêñ feodal ên ku temsila rejimê û dewleta dagirkir dikirin şer dikirin. Novel piri caran bî girtin û zindankırına qehreman kuta dibû (wek nimûne, li ba Ibrahim Ahmed an ji Mustefa Salih Kerim) yan ji bî destêñ qeyd û lelekiri li ser riya zîndanê bû (wek nimûne, li ba Xeznedar). Dî salêن 60'i da ev wêneya han a aktivistên siyasi diguhure û dikeve rengê insaneki têgîhişti ku xelkê organize û şiyar dike. Dî novelê salêن 70 da zanebûna qehreman gîhiştiye seviyeki bilinditir û loma ji kîryarên wi cuda ne. Ew carna şerê çekdari hildibjêre. Yê ku pêşengiya şer dike û xurttir e, ew e li dij dijminê dagirkir. Meriv qehremanê weha di novelên A. M. Ismail, Raûf Bagard, H. Arif, M. Mukri û yên din da dibine. Dijmin êdi ne serokpoliseki brokrat e ku bî girtin û cezakirina Kurdan kîfa xwe tine yan ji bî êşkence û derbêñ daran ceza dide wan. Dijayeti zêtir aloz e : dijayetiya navbera serdest û bindestan, navbera kolonyalist û koloniyen e. Metodêñ zordari û ceza, karekter diguhurine : ambargoya abori, êşkenceyen cuda, dardakirin, gorkirina kitlewi ya insanêñ bî can û hwd.

Ew novelistên ku di vê periyodê da aktiv bûn, ji xeyni navêñ jorê, Abdulla Saraj, Muhammed Reşid Fettah, Kakamam Botañi, Muhammed Fariq Hesen, Selam Manî, Tahir Salih Seid, Abdulla Agrin in.

Berevajiyê rewşa Kurdistanâ Iraqê, li Kurdistanâ Tirkîyê salêن 1975-80 nermahiyek hate xuyan. Rejima Tirk di van salan da, tevi zagonêñ wan ên ku zimanê Kurdi qedexe dikir, ji bo weşanêñ edebi yên bî zimanê Kurdi çavêñ xwe girt. Dî van salêñ hînek nerm da, kovarêñ duzîmani (bî Kurdi û Tirkî) hatun weşandin, wek nimûne Rîzgari, Özgûrlük Yolu (Riya Azadi), Roja Welat û Tirêj. Ji xeyni vana bîrek pirtûkêñ Kurdi hatin çap kîrin û hînek pirtûkêñ ku berê li dervayı

welat hatibûn weşandin, ji nû va hatin çap kîrin. Ev serdema nerm bî derbeya eskeri ya Ilona 1980 ji holê hate hilanin. Lî Kurdistana Tîrkiyê meriv bî taybeti kare du çirokbêjan destnişan bike, ango M. Emin Bozarslan û Flit Totani (Navê rasti Mihemed Gemici ye. Dî şîr da navê Rojen Barnas bî kar tine).

Novelên Bozarslan him bî naverok him ji bî forma xwe, kevneşopi ne. Meriv li ba novelistên Kurdistana Iraqê yên salên 40 yan ji 50' yi novelên wek ên Bozarslan dibine. Bozarslan behsa ciwarêngunditiyê dike. Ew dî pexşanên xwe da paşdamayinê, nexwendeyiyê, feqiri û baweriya bî efsaneyê kevn tine ziman. Gelek balkêş e ku Bozarslan di novelên xwe da cih nade gundiyan û şerê wan ê li dij begên feodal, tevi ku ev mijar heta iro ji li Kurdistana Tîrkiyê di rojevê da ye. Dî hînek pexşanên xwe da zulma ku bî Kurdan dibe û barbariya polis û cendirmeyen Türk distine dest. Dema ku behsa form bîbe, wîsa tê xuyan ku niviskar, xwe ji bo ditîna teknik û stilên nû neêşandiye, dêlva wi da stileke kevneşopi bî kar anîye. (42)

Stila ku Flit Totani hilbijartiyê, ji stila gelek novelistên Kurd cuda ye, ango stileke niçlêdanê (hiciv, satir) hilbijartiyê. Axlebi qehremanê novelên wi, Kurdêñ ku li bajaran bî cih bûne ne. Rûniştina wan li wan li bajaran tenê pirseke coxrafi ye -wan urf û adet û kevneşopiyêngunditi xwe bî xwe ra anine bajêr. Ji gundêngunditi xwe karekterâgunditi û paşdamayinê bî xwe ra anine bajêr û wana parastine. Dî navbera van insanî û bajar da dijberi heye. Bajar bî forma xwe wek saziyekê modern tê tarif kîrin, lê dî sistema xwe ya ramani da wek berhemeki ku ji civatek eşiri ya primitiv pêk hatibe tê pêş. Bî serda ji, bajar bî xwe ra siyasetek şoveni û êrişkar tine û ji vê siyasetê insanîn civata ku Totani rawe dike zîrarê dibinin, pê diêsin. (43)

Beramberiyeki Flit Totani lî Kurdistana Iranê novelist Ahmed Qazi ye. Pişti ku li Iranê şoreşa islami hate ser hukum, A. Qazi berhevoka novelistên xwe yên pêsi yên ku ji şes novelên gelek nêzi hev pêk dihatin çap kîr. (44) Ev novelên han niçlêdanekê jiyana civaki ye û bî zimaneki edebi û paqîj hatine nivisandin. Wîsa xuyaye ku Qazi, novelistên Kurd ên berê nas nekîriye, loma

ji xuyaye ku ew ji ali form va zêdetirin ji hunera novel a Farisi tesir girtiye. Berhevoka novelan ên bî vi rengi, yên ku bî gelek novelan bî hev va girêdayine, dî edebiyata Kurdi da ne tişteki normal û diti ye.

DAWI

Wergêr : A. GERNAS

Têbini :

- 25) Aladdin Seccadi : "Hamişê Bahar", Baxdad 1960
- 26) Ibrahim Ahmed : "Korawari", Baxdad 1959, rûp. 46
- 27) Ibid, rûp. 79
- 28) Muhammed Bekir : Hawar, kovara Kurdi (ya ji nû va weşandi), cilt. 1, Stockholm 1987, rûp. 7
- 29) N. Zaza : "Xurşid", Hawar, 27 (Nisan 1941), rûp. 10
- 30) N. Zaza : "Gulê", Hawar, 29 (Heziran 1941), rûp. 8-927
- 31) "The Encyclopaedia Of Islam" (Ansiklopediya İslami), cild 5, 1981, rûp: 483
- 32) Muharrem Muhammed Amin : "Mam Hormar", Erbil 1954
- 33) M.M.Amin : "Ademizad", Sulêymaniye 1969
- 34) Mustefa Salih Kerim : "Şehidani Qelay Dîndim", Sulêymaniye 1960
- 35) Cemal Nebez : "Lalo Kerim", Hewlêr 1956
- 36) Cemal Baban : "Xanzad", Bexdad 1957
- 37) Hesen Qızılıcı : "Pêkanini Geda", Bexdad 1972
- 38) Rehim Qazi : "Pêşmerge", çapa 1, Bexdad 1961, çapa 2, Mahakayı 1980
- 39) K. M. Ahmed : "Têgîhiştinî Rasti", rûp: 227
- 40) Neriman : Bibliyografyayı Kitêbi Kurdi", rûp: 5
- 41) Huseyn Arif: derbari berhema wi li nivisara dawi ya bibliyografyayê binihêre.
- 42) M. Emin Bozarslan : "Meyro", çapa 1 1979, İstenbol ; çapa 2 Borås (Swêd) 1981
- 43) F. Totani novelên xwe di kovara Tirêj a Kurdi da weşandiye û di navbera salên 1980 - 81 da çar hejmaren vê kovarê der çuye.
- 44) Ahmed Qazi : "Baqaben", Mehabad 1981.

SERRASTKIRINEK: Dî destpêka besê 1. da dî hevoka "Paşkoka diroki û bibliyografik" da bî xeleti "biyografik" hatiye nivisandin. Bila xwendevan vê kêmasyiyê bibaxşinîn.

PEYVÊN DÛHEV⁽¹⁾

Vazgal Bazidi

Dî Kurdi da peyvên ku lî pey hev têne xebitandinê du cure nin:

- 1-Yên ku ji du peyvên cuda pêktên.
- 2- Yêñ ku her eyni peyv in lê belê têne dubarekirin.
Lî jêrê listeyeke peyvên gurûba yekemin têñ pêşkêşkirin.

a

abûr û heyâ
abûr û şeref

aciz û hızni

agah û xeber
ağır û alav
ağır û şemal

ah û keder
ah û naz
ah û zar

al û gevez
al û vêr

am û tam

ap û bîrazi
ap û mam

aqil û feraset
aqil û his
aqil û kemal

aqil û merifet
aqil û sewda
ar û heyâ
armanc û daxwaz
arûn û qarûn
aşiq û maşûq

ava û avayi
avir û nezer

axir û aqûbet
ax û dax
ax û eman
ax û gor
ax û ox
ax û keder
ax û keser
ax û qebir
ax û wax
ax û zar
axa û axeler
axir û oxir
axin û keser

ayin û oyin

azadi û serxwebûn
azet û ikram
azet û xizmet

b

ba û babelisk
ba û bahoz
ba û baran
ba û boran

bac û xerac

bang û sela

baq û guli

bar û barxane
bar û piştî
bask û qanat
baş û qenç
bav û bapir
bav û bîra
bav û kal
bax û baxçe
bax û bostan

bedew û cindi
bedew û hori
behs û xeber
bejn û bal
belengaz û geda
belengaz û nezan
bend û ta
bend û dar
ber û best
ber û belav
ber û pişt
berf û baran
berjêr û berjor
beri û beristan
bertil û bac
bext û iqbal
bext û miraz
bext û text
bext û wujdan

bêdar û ber	ci û nîvin	dax û hesret
bê qeyd û şert	ci û star	dehl û dan
bê ser û ber	ciwan û cehêl	dek û dubare
bêtam û bêxwê	ciwan û çeleng	dek û dolav
bêri û bêrivan	cot û cobar	delal û xwinşirin
bêtir û çêtir	cot û ga	dem û dewran
bî dil û can	curm û cewab	dem û dezge
bî hisû zana	ç	
bî xêr û şahi	çak û xirab	dem û Wade
bîbe û nebe	çakûç û das	deng û behs
bîke û bîlezine	çav û brû	deng û gazi
bîrc û qesr	çav û dîl	deng û hes
bîrq û jan	çav û rû	deng û seda
bîne û bînemal	çek û postal	deng û sıtran
bîrsi û tini(bîrçi ti)	çek û posat	der û ber
bîsk û guli	çek û sileh	der û cinar
bîsk û kezi	çeleng û sîpehi	der û deşt
bîsk û tûncik	çem û av	der û devi
bihn û reng	çem û kani	derb û agîr
bir û bawer	çep û rast	derd û derman
bir û ray	çeper û kozik	derd û bela
boş û betal	ç	
boxe û beran	çil û qerqaş	derd û dax
bûk û berbûk	çil û sıpi	derd û kul
bûk û xesû	çit û berçit	derd û eş
bûk û zava	çiya û bani	derew û bêbexti
bûn û nebûn	çiya û deşt	derge û dergevan
C		
car û bar	çiya û zozan	deri û pencere
cejn û eyd	çol û beyar	dest û bask
ceng û cengbazi	çol û deşt	dest û lep
cerd û cûrd	çol û çolistan	dest û mil
cerg û hînav	D	
cerg û dil	dad û bêdad	dest û mist
cewr û cefa	dad û hewar	dest û pence
cil û berg	dar û devi	dest û pê
ci û mekan	dar û ber	dest û tili
ci û mıqam	dar û diri	dest û tîving
	dav û deling	destmal û gustil
D		
dewa û daxwaz	dev û çav	
dewa û doz	dev û diran	
dewat û dilan	dev û lêv	
dewet û şahi		
dewlet û mal		

dewr û dem	em û ew	sêl û tele
dewr û dewran	emir û mal	fêriz û pehlevan
dewr û zeman	erd û ezman	filan û bêvan
deyn û bar	ern û bihntengi	fir û fehş
dezga û dikan	crn û xeyidin	fîreh ê dewlemend
dêl û biji	erş û ezman	firtix û çirtix
dêw û cinawîr	erş û elek	fixan û nalin
dia û silav	erş û kursi	g
dijwari û tengasi	erzan û talan	ga û gavan
dijwar û xedar	cskeri û siyasi	galte û gep
dil û ceger	esq û heycan	gavan û ēivan
dil û gurçik	cşq û meşq	gazin û lome
dil û his	esq û muhbet	gazi û hewar
dil û hinav	cvd û beşer	gef û gur
dilovan û mihrivan	cvd û insan	germ û nerm
dîlxweş û kamiran	ewled û tewled	goşt û seyran
dikan û bazar	ewr û mij	gewre û giran
dinya û alem	eyb û ar	gezo û mezo
dil û gotin	czizû eirin	gêj û evter
dîrûv û girêdan	ê	gêj û lal
din û ayin	el û cşir	gil û gemar
din û diyabet	êş û jan	gili û gazin
din û evter	f	gur û qerasc
din û har	fal û falbêj	giran û comerd
din û iman	fen û fesal	giran û dijwar
diwan û diwanxane	fen û fût	giran û xedar
diwan û civat	fen û hile	girtin û berdan
dost û heval	feqir û sıqare	gor û goristan
dotmam û pismam	scrc û fol	gor û mezel
dûr û dîrêj	feryad û fixan	govend û çepik
dûr û nêziük	seqir û jar	guft û go
e	ferq û cûdayi	guh û guhar
ccûc û meçûc	f	gul û çiçek
edeb û Isûl	fêl û fercc	gul û gwher
edcp û terbiye	fêl û fort	gul û gulav
egit û erfat		gul û gulistan
ehd û qîrar		gul û gulbend
ehd û cehd		gulav û enber
		gulik û rêsi

gund û bajêr
gundi û cinar
gurz û gopal

h

hacet û hucet
hakim û emir
hal û hewal
har û din
har û héç
hat û bat
hat û çû
hatin û hewar
hat û nehat
hazır û amade
hazır û bızır
hazır û guhdar
hazır û nazır

hel û merc
helal û zelal
henek û laqirdi
henek û qeşmeri
heps û zindan
heq û hesab
heq û hıqûq
heq û rast
heq û qelend
heri û hezaz
heval û hevkar
heval û hogır
hewar û bang
hewar û gazi
hewar û helan
hevraz û berjêr
heyf û mixab
heyam û sal
heyran û hismetkar

hêdi û emin
hêl û mîl
hêsir û girin
hêsir û pepûk
hêvi û evin
hêvi û daxwaz
hêvi û niyaz

hilgir û wergêr
hilgêr û dagêr
hilm û bûx
hilm û gulm
hiseb û texmin
hisn û cemal
hiş û aqıl
hişk û ter
hişk û tahl
hız û diz

hiç û pûç
hiva û avat

hov û dewar
hov û dirinde
hol û holvan
hori û melek

huner û fen

hûr û gir
hûr û mûr

i

îlm û huner
îlm û ırfan
isûl û erkan
isûl û qayde

i

id û cejn
illah û billah
insaf û rehm
iman û pere
iman û pir

jan û bîrq
jar û perişan
jar û zeyif

jeng û gemar
jeng û qirêj
jeng û qilêr

jêr û jor

jin û jinkok
jin û mal
jin û mîr
jin û mindal(zarok)

jin û jin
jir û aqıl
jir û camêr
jiyin û afirandin
jiyin û mirin

k

kafir û musliman
kal û bav
kal û pir
kani û av
kar û bar
kar û karxezal
kar û kasibi
kar û kîrin
kar û pişe
kar û qezenc
karker û cotkar
kavîl û xopan
kaw û kubar

keç û bûk
kel û bin
kel û giri
kel û mel (pel)
kelem û stri
kelk û kar
ken û girin
ken û pîrquin
ker û bar
ker û bêdeng
ker û ga
ker û lal
ker û kor
ker û têr
kerewiz û biber


kes û kar
keser û kovan
kesk û sor
kevir û kuçik

Dewam dike

BERNAMA

KONFERANSA NAVNETEWİ YA MEM Ú ZİN Ú EHMEDÊ XANI

20. Çırıya Pêşin, În		21. Çırıya Pêşin, Şemi		22. Çırıya Pêşin, Yekşem	
17.00 - 18.00	Qeyid			14.30 - 15.30	Dan û standın
18.30 - 19.30	Xwarina êvarê			15.30 - 16.00	Navber
19.30 - 21.00	Vekîrin û sîlavkirîna mîvanan <i>Di heqê Ehmedê Xani da bî giştî agahdariyeki bî rîk û pêk Prof. Mistefa İzzeddin Rasûl</i>			16.00 - 17.30	<i>Jî aliyê edebiyat û folklor Ahmed Aras</i>
				17.30 - 18.30	<i>Jî aliyê civaki û filozofî Perwiz Cihani</i>
				18.30 - 19.30	Dan û standın
					Xwarina êvarê
07.30 - 09.00	Taştê			07.30 - 09.00	Taştê
09.00 - 10.30	Dan û standın lî ser Naveroka Mem û Zin <i>Jî aliyê diroki Prof. Şakiro Xudo Mîhoyi Jî aliyê zman Dr. Hûsêن Hebes</i>			09.00 - 10.30	<i>Berhevkirîna nivisara Mem û Zin'a Ehmedê Xani tevi şaxên zargotine (Ser pîrsâ peywandiya çavkani û efrandîna bi xudan)</i> Prof. Celilê Celil <i>Di rewşa iroyini da pêvendi û bandûra Ehmedê Xani û Mem û Zin lî ser Kurdish Mîhemmed Anwar</i>
10.30 - 10.45	Navber				
10.45 - 11.30	Dan û standın			10.30 - 11.00	Navber
11.30 - 12.30	<i>Jî aliyê din Sabah Kara Jî aliyê hizra netewi Mehmed Emin Bozarslan</i>			11.00 - 12.30	Dan û standın
12.30 - 14.30	Xwarina nivro			12.30 - 14.00	Xwarina nivro
				14.00 - 15.00	Dan û standın lî ser Konferansê
				15.00	Dawiya Konferansê



Bıha 15 Skr